


Parêzerên Abdullah Öcalan:

Tecrît jiyanana Öcalan tehdît dike



✓ Dozgerên DGM'ê doznameya Öcalan çapand. Di doznameyê de darvekirina Öcalan tê xwestin. Di qada navneteweyî de ew daxwaz dibe sedema metirsiyan.

Li aliyê din parêzerên Öcalan balê dikişînin ser mercên giran ên ku Öcalan tê de ye û diyar dikin ku ew merc tenduristiya wî dixin xetereyê.

Her wiha Konseya Serokatîyê ya PKK'ê û ERNK'ê ji bo daxuyaniyên cuda bal kişandin ser planên împeryalîstan ên bo tasfiyekirina Öcalan û ji gelê kurd xwestin ku ji bo parastina Öcalan rabin ser piyan.


(Nûçe:R-3)

Rojnameger Mehmet Aktaş:

Divê rojnamegeriya kurdî bikeve xeteke neteweyî

✓ Divê rojnamegeriya kurdî bikeve xeteke neteweyî. Lewre divê xîtabî her çar parçeyên Kurdistanê bike. Ger di sedsala 21' an de, zimanê neteweyekê nebe zimanê ragihandinê û çapemeniyê, wê ew ber bi tunebûn û mirinê ve biçê. Lewre teqez divê zimanê kurdî bibe zimanê çapemenî û ragihandinê. Divê zimanê kurdî bi tenê nebe zimanê lîstîk, muzîk û govend e.

(Hevpeyvîn:R.8-9)



ŞEHÎD-BÎRANÎN:
M. SELİM SUNCAK

Hevalê Hesên (M. Selim Sunca) di sala 1960'î de li gundê Tinatê yê bi ser Nisêbînê ve, ji dayik bû. Malbata wî xizan û feqîr, bavê wî bi destekî bû. Xwişk û birayên wî, ji ber feqîriyê koçî Îzmîrê kiribûn. Hesên, li ber destê bavê xwe dima. Lewre Hevalê Hesên hê zû ked û kedkarî nas kir. Hevalê Hesên mirovekî beşerxweş û devliken bû...

(Dûmahîk: R-6)

SILOBODAN MILOSEVIÇ:

BERÎ NATO'YÊ 'TEVGERA
CUDAXWAZ' NE ÇEKDAR BÛ




“Em ji hemû serdanvanên xwe yê biyanî re dibêjin ku Yûgoslavya mîna keke baş a nêzîktêdayîna li hemberî hemû hindikahiyên neteweyî ye. Li gorî me pîvana demokratbûna welatekî nêzîktêdayîna desthilatdarên wî welatî ya li hemberî hindikahiyên e. Gelek kes ji Kosovayê direvin. Sirb, tirk, mitrib, misilman û tabî albanî jî. Ne tenê mirov, hemû giyanewer ji ber bombebarana NATO'yê direvin.”

(Hevpeyvîn: R-11)

DI SERDEMA KT'Ê DE
LÊGERÎNÊN FOLKLORÊ

Dema ku em li ser vê mijarê derdikeve pêşberî me. Gelê kurd di dîroka xwe de ji destê xayinan derdê giran kişandiyê. Di vê babetê de jî beramberî xiyana Ziya Gökalp dimîne. Yek ji lêgerînerên destpêkê yê KT'ê jî Ziya Gökalp e. Gökalp, di 1913'an de di nivîseke xwe de, çanda gelê kurd û Kurdistanê wekî çanda Asyaya Navîn nîşan dide.

(Dûmahîk: R-4)



E-Mail: s.berbang@usa.net

SAMI TAN

Civaka tirk serdanpê warê nakokiyar e. Li aliyekî filmên Yılmaz Güney ji aliyê bi sedhezaran kesî ve tene temaşekirin, li aliyê din dijminatîya herî tund li hemberî tevgera gelê kurd tê meşandin.

Dîwarê şovenîzmê û tevgera gelan

Tirkiye her ku diçe zêdetir dibe welatê nakokiyar. Mirov nizane li gorî kîjan gotin û tevgerê helwest bigire. Li aliyekî dozgerên DGM'ê hebûna gelê kurd înkâr dikin û ji nû ve vedigerin ser teoriyên "kart-kurt", li aliyê din Serokê Dadgeha Zagona Bingehîn qala demokratîkbûnê dike û rakirina qedexeya li ser zimanê kurdî dixwaze.

Tiştê ku gotinên serokê dadgeha navborî girîngtir dike helwesta çapemeniyê ya li hemberî van gotinan e. Dema mirov bala xwe dide çapemenî û televîzyonên tirk, tê dîtîn ku gişt piştevaniya ve daxuyaniyê dikin. Mirov di mebesta ve helwestê jî nagihêje, lewre bi salan e ku medyaya tirk li dijî hêzên demokratîk û demokratîkbûnê tevdigere, kesên ku cuda difikire wekî dijminê Tirkiyeyê nîşan dide. Lê îro ji nişka ve wekî piştevanên demokratîkbûnê derdikevin holê û doza azadiya derbirina ramanê dikin.

Civaka tirk serdanpê warê dubendî û nakokiyar e. Li aliyekî filmên Deniz Gezmiş û Yılmaz Güney ji aliyê bi sed-

hezaran kesî ve tene temaşekirin, li aliyê din dijminatîya herî tund li hemberî tevgera gelê kurd tê meşandin. Gelek kesên ku li filmên Yılmaz Güney temaşê dikin, bi çavê lehengekî li Deniz Gezmiş dinêrin, pirtûkên Nazım Hikmet dixwînin û piştê dengê xwe didin partiyên mîna DSP û MHP'ê. Tê nagihêjin ku jiyana kesên navborî di şerê li hemberî bîrdoza van partîyan re derbas bûye. Em bawer in kêmeşkerên ku li Kurdistanê leşkerî kirine û li hemberî gelê kurd dest avêtine metodên hovane, pirtûkên Nazım Hikmet û Yaşar Kemal nexwendine.

Mirov nizane ka çawa ew wan her du tiştan bi hev re dimeşînin. Mirovekî ku helbestên Nazım Hikmet bixwîne çawa dikare bibe neteweperest û zilmê li kedkarên kurd bike. Kesê ku "Mihemedok" nas bike û dilê wî/wê bibije tevger û têkoşîna wî, çawa dikare dijminatîya gerîla bike.

Lê gelek tirk van her du tiştan bi hev re dimeşînin. Ev jî dide nîşan ku şerê taybet gelê tirk nexweş xistiye û ev

nexweşî tenê dikare bi têkoşîneke tund a li hemberî şovenîzmê bê xweşkirin. Lê mixabin hinek çepgir li şûna ku bi şovenîzmê re têkoşîneke tund bimeşînin, çavên xwe ji ve bîrdoza faşîst re digirin û dixwazin bandora ve bîrdozê xwe bi xwe ji holê rabe.

Li vir gotineke rewşenbîrê tirk Mahir Sayın tê bîra mirov. Wî digot, "ÖDP li cihê ku di ser dîwarê şovenîzmê re derbas bibe, dixwaze li dora dîwêr bizivire, lê nizane ku ew dîwar bi qasî Seda Çîne dirêj e." Ev gotin gelekî di cihê xwe de ye û di ser wî dîwarî re qewazdan êdî wekî berê ne hêsan e. Lewre berê neteweperestî ew qas ne tund bû. Îro rêjeya piştevanên partiya faşîst bûye %18, û hemû partiyên birjuva ji berê zêdetir bûne neteweperest. Dengên ku ÖDP'ê girtine, nîşan dide ku wan nekariye di dor dîwêr re bizivirin, ewê çawa di ser re qewaz bidin em nizanin. Lê em bawer in dê tevgera şoreşger a gelan wî dîwarî birûxîne.

"Bajarê Mirinê"

RÊNAS KAYA

Diyarbakir; zaroka herî esmer a gelê Kurd e. Bajarekî bi kevîr û bextreşîya xwe esmer. Gelek nav di hinavê xwe de dihevine. Ji Amîdê heta Amedê; ji Diyarbakirê heta Diyarbakirê tevî wateyên xwe rêza navan.

Çiroknivîs Suzan Samancı, navekî din lê zêde kiriye. Ev nav, yek ji navên ku salên dawî yê Diyarbakir herî baş dianî zimên bû: "Bajarê Mirinê"

Rojên ku dilopên xwînê li ser şevên tarî yê Diyarbakirê, dihatin niqutandin. Piştê xebera nexêr ku zû dihat, an "mirin" bû, an jî bêdengîya bi rengê "windakirin" bû.

Li vî bajarî gelek zarok zêde bûn, ku li benda dê û bavên xwe bûn. Zarokên bi elem, agahiyên der barê dê û bavên wî de, piştî demeke kin di nav rûpelên zer ên rojnameyan û refên komele û dozgeran de, di nav toz û telazê de man.

Piştî telefona ku ji Dozgeriya Komarê ya Hezexê (İdil) bo İHD'yê hat, bendemayîna windabûyîne cihê xwe ji nûçeyên "mirinê" re hişt. Ji bo teşhîsa

Fahriye û Mahmut Mordenîz ku di sala 1996'an de li Amedê ji hêla kesên ku xwe wekî polis dabûn naskirin, hatibûn revandin, rayedarên İHD'yê, xizmên wan anîbû Hezexê. Teşhîs hate kirin lê cendek li holê tune bûn. Ji ber ku cendekên bi sedan kes xistibûn nava gorekê, eşkerekirina cihê cendek lê ne, nepêkan bû.

İHD, ji kewçêra 1998'an pê ve bo Hezexê çû û hat. Çavdêrî, lêkolîn, wêneyên ku hatin teşhîskirin û malbat.... Encam? Hezex, Cizîr û Silopî, ji hêla hêzên leşkerî ve wekî sêgoşeya mirinê hatibû bikaranîn. Di salên 1990'î de li ve sêgoşeyê bi sedan kes, guleyekê ji paşîya serê xwe ve hatibûn kuştin.


Diyarbakirê, bi revandinên ku ji hêla hêzên leşkerî ve dihatin kirin, koçî Şernexê kiribû û Şernex yek ji navên Diyarbakirê wergirtibû ser xwe: "Bajarê Mirinê"

Di van rojên dawî de, nûçeyên ku ji Şernexê tên, ve gotina li ser bajêr diçêspîne. Resul Kılıç û Hacı Atan ku nû ji leşkeriyê hatine, ji hêla cerdevan û leşkeran ve tene kuştin. Du kurdên ku serê wan bi beramberî pereyan ji gew-

deyên wan hatibûn jêkirin, ji hêla Waliyê OHAL'ê ve wekî "Terorîst" hatin îlankirin. Daxuyaniyên ku malbatên wan dan, derxist holê ku ji bo serê mirovan pere wekî rêbazekê ye. Hevdi tinên ku parlementerê Amedê Haşim Haşimi ku bi Serokwezîr Bülent Ecevit re kirin, bêencam man. "Herêmî Leşkerî ye, yê hatine kuştin terorîst in, tiştê bê kirin tune ye"

Beriya hilibijartinê li Şirnexê li gorî agahiyên ku Şefik Tanrıverdi dabû leşkeran, rayedarên leşkerî û sivil êrîş bir ser gundê Kuştepeyê û rastî dimenên sosret hatin. Cendekê 18 kesên kuştî ku avêtibûn çalekê û binax kiribûn, dîtîn. Li gorî daxuyaniyên Tanrıverdi ku endamê rêxistina Hizbullahê ye, di kuştina 18 kesî de tiliya serekcehş û Serokê Belediyeya Cizîrê Kamîl Atak heye. Tê gotin ku berpirsên ve qirkirina ku di sala 1996'an de pêk hatiye, birayên Kamîl Atak, Raûf û Mehmûd in.

Nûçeyên bi vî rengî li Şirnexê berdewam in. Ne rayedarek ne ji rêxistîneke mafên mirovan tiştêkî nake an jî nikare bike. DiyarbakirŞirnex : "Bajarê Mirinê"



Filmê "İsa" bi kurdî jîyan û ramanên Hezretî İsa dide pêş. Ev berhem, dê kesê ku hûn bawer in hûn wî nas dikin ji nêz ve bi we bide nasîn.

NAVNÎŞANA XWESTINÊ
PK.8 Acıbadem 81020
İSTANBUL

AZADIYA WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ (Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN
■ Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308
Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212) 251 79 37 - 251 90 13
FAX: 251 95 85
■ Gerindevê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)

SAMI TAN
■ Berpirsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)

M. SALİH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon:
Ses Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.
■ BELAVKIRIN
BIRYAY Dağıtım
■ NIVİSGEHÊN TÊKİLİYÊ
(İrtibat büroları)

■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83
■ Mersin
Tel: 0 (324) 233 83 96

■ Edene
Tel: 0 (322) 351 42 78
■ (Nünerê Giştî yê Ewropayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
■ Swisre:

İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07

■ Almanya:
Fener Rojbiyani
Tel: 49 228 92 51 284
■ Sweden:
Şoreş Reşî
Tel: 46 86 52 34 29
■ Fransa:
M. Ali Doğan
Tel- 33 614 32 43 55

■ Belçika

I. Can
Tel:32 53 64 12 41

■ Hollanda:
S. A. Fewzi

Tel-Fax: 31 10 48 555 43

■ Suriye:

Jana Seyda
Helim Yüsiw

Kurtenûçe

MGK'Ê BIRYARA XWE BI CIH ANÎ

Li gorî agahiyên ku ji çavkaniyên LHADEP'ê bi dest ketine, MGK'ê rêjeya dengên ku dê HADEP bistîne berî hilbijartinê bo raya giştî diyar kir û piştî hilbijartinê jî ji bo ku dengên HADEP'ê dernekevin ser vê rêjeyê dest avêt hinek "bergiriyar". Tê gotin ku di lêpîrsîna MGK'ê ya berî hilbijartinê de rêjeya piştevanên HADEP'ê wekî %13 derketiye, lê ev rêje wekî %5 bo raya giştî hatiye ragihandin. Li pey agahiyên ku çavdêrên HADEP'ê dane, ji bo bicihanîna biryara MGK'ê li gelek deveran rayên HADEP'ê hatine dizîn an jî betalkirin. Ev çavdêr bûyerên li cihên mîna Dêrsim, Îdir, Giyaşîn, Mûş û Mêrsînê wekî mînak pêşkêş dikin.

DEMIREL LI WASHINGTONÊ JÎ ÊRÎŞÎ ÇAPEMENIYA KURD KIR

Li gorî agahiyên ku ji çavkaniyên Lcur bi cur bi dest ketine, Serokomarê Tirkîyeyê Süleyman Demirel di hevdîtinên xwe yên li Washingtonê de jî girtina Rojnameya Özgür Politika û DEM Ajansê xwestiye û ji bo girtina MED-TV'yê spasiyên xwe pêşkêşî Serokwezîrê Îngilistanê Tony Blair kiriye. Serokomarê Tirk Demirel li Washingtonê bi Serokwezîrê Almanyayê Gerhard Schröder re hevdîtinek pêk anî û jî Schröder xwest ku ew jî gaveke wekî Îngilistanê bavêje. Hate gotin ku Demirel di hevdîtinên xwe de giranî daye ser înkarkirina Kêşeya Kurd, ev dîtîna bi van gotinên Demirel jî hatin selmandin: "Em lê dixebitin ku têkiliyên PKK'ê yên navneteweyî qut bikin." Demirel bi boneya pîrozbahiyên 50 saliyê yên NATO'yê çûbû Washingtonê.

SEROKÊ DADGEHA ZAGONA BINGEHÎN DEMOKRASÎ XWEST


Serokê Dadgeha Zagona Bingehîn Ahmet Necdet Sezer, roja 26'ê avrêlê di axaftineke xwe de nedemokratîkbûna zagona bingehîn a Tirkîyeyê anî zimên û xwest ku xalên antî-demokratîk bînin guhartin. Sezer bal kişand ser nakokiya di navbera zagonên navneteweyî û xalên antî-demokratîk ên Tirkîyeyê de û pêwîstiya lihevanîna wan anî ser zimên. Serokê Dadgeha ku heta niha bi dehan partî bi biryara wê hatine girtin, jiholêrakirina zagonên ku li ber azadiya derbirina ramanê dibin asteng jî xwest. Zagonên ku guhartina wan jî hêla Sezer ve hate xwestin ev bûn: Zagona Tekoşîna Bi Terorê Re, Zagona Partiyên Siyasî û Zagona li ser DGM'ê.

NAVENDA NÛÇEYAN

Parêzerên Abdullah Öcalan:

Tecrît jiyana Öcalan tehdît dike

Li ser rewşa Öcalan di daxuyaniya Konseya Serokatîya PKK'ê de wiha hatiye gotin: "Kirinên ji bo tasfiyekirina Serokê me yê neteweyî jî dê zêdetir bibin. Îşkenceyên fizîkî, derûnî û tibî dê zêdetir bibin." Dîsa jî diyarkirin hêzên dagirker dixwazin Öcalan ji holê rakin û hemû xebatên wan vê yekê nîşan dide.



Dozgerên DGM'ê doznameya der barê Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan de, da ber çapê. Di doznameyê de tiştêkî cihêreng balê nakîşîne, tiştên ku berê di çapemeniyê de hatine weşandin, hatine dubarekirin. Tiştê ku di doznameyê de balê dikişîne, dîsa hebûna gelê kurd hatiye înkarkirin. Li gorî dozgerên DGM'ê, gelekî bi navê kurd li Tirkîyeyê nîn e. Her wekî di hate zanîn, di dawîya doznameyê de ji bo Öcalan cezayê darvekirinê hatiye xwestin.

ev yek jî xetereya li ser tenduristiya Öcalan zêdetir dike. Bo nimûne berî hevdîtina dawîn, ji parêzeran re hatiye gotin ku divê ew bi keştiya xwe biçin Îmraliyê lê ji ber ku ketina herêmê bo keştiyên sivil hatiye qedexekirin, ev yek tê wateya astengkirina mafê hevdîtinê û xweparastinê ya Öcalan. Her wiha parêzerên Öcalan ji ber ku di nava rûpelên xwe de heqaret li wan û Öcalan hatiye kirin, der barê 18 rojnameyên tirkan de daxuyaniya sûc da. Parêzeran xwest ku, çapemenî dev ji vê helwesta xwe ya neyinî berde û li gorî sinc û rêçikên rojnamegeriyê tevbigere. Hate gotin ku, heke bi vî awayî neyê tevgerîn, ew dê serî li saziyên pişeyî yên navneteweyî û Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê bidin.

ERNK: Tekane wezîfeya gelê me parastina Serokê Neteweyî ye

Konseya Serokatîyê ya PKK'ê jî li ser qewmînên dawîn û rewşa Öcalan roja 24'ê avrêlê daxuyaniyek da çapemeniyê. Ev daxuyaniya roja 26'ê mehê jî hêla Ajansa DEM'ê ve hate belavkirin. Her wiha ERNK'ê jî li ser mercên ku Öcalan tê de ye daxuyaniyek belav kir. Van her du daxuyaniyan di çapemeniya navneteweyî de bi berfirehî cih girt.

Di daxuyaniya Konseya Serokatîyê ya PKK'ê de tê gotin ku, encama hilbijartinên li Tirkîyeyê jî hêla hêzên împeryalist û dagirker ve hatiye diyarkirin û serketina MHP û DSP'ê jî mêj ve hatiye plankirin. Serkeftina van partiyên jî wekî dîlgirtina Öcalan û girtina MED-TV'yê parçeyekî komploya li dijî gelê kurd tê nirxandin. Her wiha êrişa li ser Yûgoslavyayê jî wekî parçeyekî heman planê tê dîtîna û durûtiya hêzên împeryalist tê şermezarkirin.

Li ser rewşa Öcalan jî di daxuyaniyê de ev tişt hatine gotin: "Kirinên ji bo tasfiyekirina Serokê me yê neteweyî jî (wekî daxwazeke dirûvê faşîzmê yê nû) dê

zêdetir bibin. Îşkenceyên fizîkî, derûnî û tibî dê zêdetir bibin." Wekî din hatiye gotin ku hêzên dagirker dixwazin Öcalan ji holê rakin û hemû xebatên wan vê yekê nîşan dide. Dîsa daxuyaniya balê dikişîne ser girtina MED-TV'yê, zilma li ser HADEP'ê û tê gotin ku dê mercên jiyane jî bo gelê kurd û hêzên demokratîk girantir bibin.

Di daxuyaniyê de hatiye xwestin ku gelê kurd û hêzên demokratîk li hemberî vê yekê hişyar be û ji bo gurkirina têkoşînê hêza xwe bike yek. Her wiha hatiye diyarkirin ku, wê PKK li hemberî vê êrişa hêzên dagirker şerê rizgariyê gurtir bike û bersiveke tund bide hêzên dagirker û împeryalist. Di daxuyaniyê de bi van gotinan stratejiya xwe ya rojên li pêş diyar dike: "Wê Partiya me mafê jiyane nede hêzên ku mafê jiyane nade gelê me."

Di daxuyaniya ERNK'ê de jî li ser planên împeryalîstanê tê rawestandin û tê gotin ku hêzên împeryalist nikarin gelên bindest rizgar bikin. Dîsa tê ragihandin ku hêzên împeryalist dixwazin li herêmê, Tirkîyeyê bikin hêzêke sereke, li ber vê yekê jî kelema herî mezin PKK ye. Lewre jî ew dixwazin heta sala du hezarî PKK'ê jî holê rakin. Jiholêrakirina Öcalan di vî daxuyaniyê de jî wekî parçeyekî plana împeryalîstanê hatiye destnîşankirin. Daxuyaniya ERNK'ê bi vî bangê diqede: "Peywira sereke ya gelê kurd parastina canê Serokê Neteweyî ye. Ji bo pêkanîna vî wezîfeyê divê hemû gelê Kurdistanê rabe ser piyan."

Vê daxwazê, di qada navneteweyî gelekî deng veda û gelek saziyên navneteweyî li dijî vî daxwaza dozgeran nerazîbûna xwe diyar kir. Bo nimûne, Parlamentoya Ewrûpayê da zanîn ku ew dê du parlamenteran wekî çavdêr bişînin dadgeha Öcalan. Li gorî nûçeyê ku roja 27'ê avrêlê di rojnameya Özgür Politikayê de derket, berdevkê Parlamentoya Ewrûpayê mebûsê îngilîz Russel Johnston, li ser vî mijarê daxuyaniyek daye çapemeniyê û di vî daxuyaniyê de hatiye gotin ku, dê parlamenterê macar Andreas Barsony û yê Filandî Gunnar Jansson wekî endamên Parlamentoya Ewrûpayê beşdarî dadgehê bibin. Her wiha Rêxistîna Efüyê jî daxuyand ku ew dê çavdêran bişînin dadgehê. Roja 29'ê avrêlê jî aliyê vî rêxistinê ve daxuyaniyek hate dayin û di vî daxuyaniyê de ji serokwezîrê tirk hate xwestin ku bi awayekî dadyane darizandîna Öcalan bê misogerkin.

Mercên ku Öcalan tê de ye girantir dibin

Li aliyê din parêzerên Öcalan bal kişandin ser rewşa ku Öcalan tê de ye û diyar kirin ku Öcalan belkî di bin van mercan de nikaribe parastina xwe bike. Parêzerên Öcalan serî li Komîteya Parastina Ji Îşkenceyê jî da û jê xwest ku bi awayekî rêk û pêk biçin serdana Öcalan. Di serîlêdana parêzeran de tê gotin ku mercên tecrîtê bandoreke neyinî li tenduristiya fizîkî û derûnî ya Öcalan dike û ew merc rê li ber amadekirina parêznameyê digire. Parêzerên Öcalan diyar kirin ku rê li ber hevdîtina wan jî tê girtin û

Di serdema Komara Tirk de lêgerînên folklorê

Dema ku em li ser vê mijarê hûr dibin, dîsa dîroka îxanetê; ya ku ji Harpagos dest pê dike û heya roja îro didome, derdikeve pêşberî me. Gelê kurd di dîroka xwe de ji destê xayinan derdê giran kişandiyê. Di vê babetê de ji beramberî xiyaneta Ziya Gökalp dimîne. Yek ji lêgerînerên destpêkê yên KT'ê jî Ziya Gökalp e. Di 1913'an de di nivîseke xwe ya ku di Kovara Halka Doğru de derketiye de, çanda gelê kurd û Kurdistanê wekî çanda Asyaya Navîn nişan dide. Ev xebata Ziya Gökalp ji bo lêgerînerên tirk ên pêşerojê jî bûye çavkaniya bingehîn. Wekî rapora TOBB'ê ya wê demê tê pejirandin. Gökalp di pirtûkên xwe de jî, li ser eşîretên kurd û jiyana kurdan gelekî radiweste. Ji vî aliyê ve dibe aqilmendê dewleta tirkan ê herî girîng û dibe serekdizê çanda kurdan.

Di sala 1914'an de di Rojnameya İlk Adım de Fuat Köprülü di heman salê de di Rojnameya Peyam de R. Tefik Bölükbaşı derbarê mijara folklorê de kurtenivîs nivîsandine. Ev kurtenivîs bi tevayî li ser şopa Ziya Gökalp in. Dîsa di weşanên KT'ê yên seretayî; Darulelham Külliyyeti Defterleri de Rauf Yekta Bey; di sala 1924'an de di Kovara Halk İlmi de Selim Sırrı Tarcan hwd. ku bi serê xwe xebata lêgerîna folklorê didomandin, hewl didin ku bo folklorê saziyek bê avakirin. Ji bo belgekirin, arşivkirin û sazîbûna folklorê û çandî nîqaşên ber fireh pêk tên. Ev kes bo damezirandina saziyê folklorê, şewr û şiroveyên xwe ji dewletê re dişînin. Li folklorê Trakyaya, Deryaya Reş, Anatolî û Kurdistanê xwedî derdikevin û dixwazin ku KT li ser vê babetê saziyan ava bike.

Ew kesên ku mîsyoneriya folklorê, (ango dizîna folklorê gelan) didine ber xwe, di dawiyê de pêşniyazên xwe bi dewleta xwe didine pejirandin.


Di serdema Komara Tirk de saziyên folklorê

Di 1927'an de gava yekem tê avêtin. Li Enqereyê Anadolu Halk Bilgisi Derneği tê avakirin. Ev komele peyre navê xwe diguherîne û dibe Halk Bilgisi Derneği. Bi navê Halk Bilgisi Haberleri jî weşanekê çap dike. Di 1932'yan de Halkevi bi navê Şaxên Gundan saziyêkê ava dike. Saziya navborî li Kurdistanê li gund û bajarên digere, materyalan berhev dike, lêkolînan pêk tîne. Derbarê xebata xwe de broşûr û rojnameyan diweşîne. Halkevi bi vê yekê jî nasekine; dizên navdar (lêkolîner û lêgerîner) digihîne.

Di 1955'an de Türk Sanatları ve Ananeleri Tetkik Cemiyeti (Komeleya Analîza Huner û Toreya Gelê Tirk) tê damezirandin. Ev sazî bi çend sal şûn ve navê xwe diguherîne û dibe Folklor Araştırmaları Kurumu. Ji bilî van saziyan jî gelek sazî tene avakirin: Türk Folklor Enstitüsü Kurma Derneği, Türk Folklor Kurumu (1966), Milli Folklor Enstitüsü (1966), Milli Folklor Araştırmaları Derneği, Türk Halk Oyunlarını Yayma ve Yaşatma Derneği, Türk El Sanatlarını Yayma ve Yaşatma Derneği, Türk Folklor Kurumu çend ji wan in.



İlhan Başgöz



KÜLTÜR BAKANLIĞI

BAŞVURU KİTAPLARI

Dizî û talana ku bi destê van saziyan hatiye kirin, hêj jî baş diyar nebûye. Em hîn nizanin ku çi qas xwîn ji laşê me kişandine û çi bi xwîna me kirine. Her yekê ji wan, mîna rêxistinên îstîxbaratê xebatên xwe domandin. Wan çand û hunera gelê kurd û gelên din belav kirîye. Hewl dane ku bi vê talanê jî xwe re "çandeke nû" "nasnameyêke nû" biafirînin. Bi nixên gelê kurd, jiyana xwe bixemilînin.

Di serdema Komara Tirk de xebatên berhevokî

Xebata berhevkirinê digel dijwarbûna xwe xweş e jî. Mirov li gund û bajarên welêt gav bi gav digere; dikeve cihana gelan û wan dinase, şirove dike û berhemên girîng bi dest dixê. Li hemberî peykerekî dîrokî arkeolog; bi nasîna melodyeke wînda muzîkjen; bi dozîna parzemînekê dahêner çawa dilxweş dibe; berhevkarê folklorê jî ew qasî kêfxweş dibe. Destan, motîf, muzîk, reqs; amûrên muzîkê, jiyana rojane, listikên gelêrî, listikên zarokan, cil û bergên gelêrî û hwd. coşeke mezin dike dilê folklorvan. Xebata folklorê bi qasî xweşbûna xwe, pîroz e jî. Dema ku mirov baş di rastiya vê xebatê digihêje, xebata ku dike watedar dibe. Lê xebat tenê ne bes e. Pêwîst e armanca xebatê jî were zanîn. Armanca, neynika herî xurt e.

Xebatên lêgerînerên tirk ên li ser folklorê kurdî jî, bi armanca xizmeta dagirkeriyê pêk tên. Di xebata berhevokî ya muzîka gelêrî de navê herî balkêş, Muzaffer Sa-

Xebatên lêgerînerên tirk ên li ser folklorê kurdî, bi armanca xizmeta dagirkeriyê pêk tên.

Konservatûara Dewletê ya Enqereyê ku girêdayî MEB'ê ye, di salên 1937-1957 de li ser hev 19 caran li ser Kurdistanê sefer pêk anîn. Di vî 19 carî de jî 10.000 zêdetir stran û kilamên gelêrî yên kurdan tomarî plak û kasetan kir.

rîsözen e. Konservatûara Dewletê ya Enqereyê ku girêdayî Wezîriya Perwerdehiya Neteweyî (MEB) ye, di salên 1937-1957 de li ser hev 19 caran li ser Kurdistanê sefer çêkir. Di vî 19 carî de jî 10.000 zêdetir melodyên gelêrî tomarî plak û kasetan kir. Melodiyên kurdî, li gorî alfabe ya tirkî rêz dikin û dikine arşivên xwe. Ev melodî, di salên dawî de tev bi navê "Çanda Tirk" tenê bikaranîn. Serkêşê vê xebatê jî M. Sarsözen e, ku bi eslê xwe ji Koçgiriye ye.

Di 1957-58'an de Pirtûkxaneya Neteweyî ya Enqereyê Beşa Muzîkê li ser hev 6 caran diçe Kurdistanê. Di encamê de 117 kaset bi melodyên kurdî tene tomar kirin. Van berhemên jî dixine arşiva "Çanda Tirk".

Ji vî aliyê ve xebatên TRT'ê jî yên hemû saziyan girîngtir in. Ji sazîbûna xwe heya îro TRT'ê bi sedan sefer, xebatên komî, lêkolîna lêgerîn, xebatên bijarte û xebatên etîd pêk anîne.

TRT di sala 1967'an de li herêmên Dilûk, Wan û Erzeromê bi nêzî deh koman xebatên berhevkarîyê dimeşîne. Ev xebat ji TRT û Komara Tirk re dibe arşiveke dewlemend. Beriya vê xebatê, arşiva TRT'ê pir qels bû. Ji çend sed melodî û stranên gelêrî pêk dihat. Piştî vê xebatê bi deh hezaran stran û melodyên gelêrî di arşiva TRT'ê de cihê xwe girt. Niha jî bi navê "Türk Halk Müziği", "Türk Sanat Müziği" tenê pêşkêşkirin.

Di 1971'ê de, li herêmên Erzerom, Agirî û Hawirdora wan li ser navê TRT'ê, Nida Tüfekçi 250 melodyên def û zirnê kom dike û bi heman armanca dike arşiva TRT'ê. Ev melodî jî dibin "Çanda Tirk".

Hemû navên ku di vê xebata qirêj de cih girtine, ji aliyê raya giştî ve baş tene nasîn. Bedri Rahmi Eyüboğlu, Pertev Naili Boratav, Eflatun Cem Güney, Şerif Baykurt, A. Kutsi Tecer, Hasan Üçok û hwd. Bi dehan nivîskar, hunermend, lêkolîner di vê xebatê de cih digirin. Xebatên van kesan ji aliyê raya giştî ve hatine pejirandin û ecibandin. Piraniya wan jî wekî demokrat, çepgir û rewşenbîr tene nasîn. Xebatên lêgerînên li ser folklorê, gelek caran bi berhemên van kesan hatine weşandin. Ev kes di warê folklor, çand û hunera gelan de bûne çavkanî.

Talan û şelândina çand û hunera gelê kurd hêj jî didome. Lê hêj jî baş nayê zanîn ku ev talankerî çi qasî kûr û berfireh e. Kîjan sazî û kes di vê xebatê de cih digirin? Hewce ye ku ev pirs di pêşerojê de bêne bersivandin û nixên ku hatine dizîn yek bi yek derkevin holê. Ev yek dê bi xebata gelê kurd eşkere bibe.

MAHMUT YAMALAK

Peyvên mecazî

Li ser vî cûreyê peyvan gengeşî û nirxandinên têvel hene. Li gorî hin nirxandinan peyvên navborî biwêj nîn in. Lê dema ku li gorî rêz û rêçikên danasîna giştî ya biwêjan tê dahûrandin, dirûvê biwêjan bi wan dikeve.

bi qasî ku tê zanîn biwêj digel ku şibandîne di xwe de dihevinin jî ji wateya xwe ya bingehîn dûr dikevin û wateyeke din hildigirin. Lewre jî êdî dirûvê şibandîne pê nakeve. Li ser peyvên navborî dîtînan cuda hene. Li gorî hin dîtînan ev peyv rengdêr in. Tevî lêkolîn û gengeşîyan jî li ser navlêkirina van peyvan em negihîştin encameke teqez. Lewma jî em vê gavê dikarin peyvên navborî wekî peyvên mecazî bi nav bikin.

- Aqilsivikî:** Kêmaqilî û neşarezayî
- Bejnbihestî:** Cûcebûn, bejn (qam kinbûn)
- Bêhnfirehî:** Bi sebr û arambûn
- Bêhntengî:** Acizî, bêzarî
- Cangiranî:** Tiral, nelihew û nejêhatîbûn
- Cansivikî:** Jêhatîfûn, çalakbûn
- Çavbarî:** Nedexesî, xêrxazî
- Çavnebarî:** Dexes û xêrnexazbûn (çekememezlik)
- Çavsorî:** Hovîti, dirindeti(gözü kara olmak hali)
- Çavreşî:** Dexesî û hesûdî
- Çavtengî:** Tima û çikûsbûn

- Çavtirsî:** Geflêxwarin, tehdîtkirin.
- Devşkestî:** ji bo kesên reben, belengaz û sist, tê gotin
- Destdirêjî:** Xurtbûn û karîgerbûn
- Destdirêjî:** Tecawizkarî û çewisan-din
- Destengî:** Xizanî û feqîrî
- Destbelayî:** Mirovê berxerc û îsrafkar
- Destbelayî:** Mirovê bîteşqe
- Destgirtî:** Mirovê tasarûfkar
- Destvekirî:** Mirovê merd
- Destkinî:** Mirovê xizan û bêimkan
- Destvalayî:** Kesê bêkarûbar û aware
- Dilreşî:** Kesê xêrnexwaz, fesad û hesûd
- Dilkirî:** Razîkirin û dana ber dil
- Dilgirtî:** Mirovê xeyidî, dilê wîwê ji kesekî mayî
- Diltengî:** Rewşa bêzarî û hêrsbûnê
- Dilkeçik:** Mirovê şermoke û nermik
- Dilhewîn:** Dilsoz, jîdil
- Dilodîn:** Mirovê bêbiryar û biguman
- Dilodîn:** (Delidolu)
- Dilsoz:** Kesê dilxwaz û hezkiriyê kesekî an jî tişteki
- Dilgirs:** Kesê bêrehm û bi gir û kîn

- Dilpolayî:** Wêrekî, mêrxasî û bêtirs-bûn
- Dilparsek:** Mirovê çavbirçî(maymun iştahlî)
- Dilsarî:** Hêvîşkestîbûn
- Dilse:** (Şipsevdi,mamun iştahlî)
- Diltenik:** Kesê hestiyar (yufka yû-rekli)
- Guhdirêjî:** Ker, Ehmaqî û kertî
- Guhbel:** mirovê sîxûr û ajan, (radar-ları güçlü)
- Guhrep:** Kezê kone û qurnaz
- Kerxwir:** Kesê çavbirçî û têrnexwir
- Nefsbiçûkî:** Mutevazîbûn
- Pêxasî:** Kesê tolaz, lûmpen û bêkêr
- Pêgirani:** Tiralî û sistî, kesê ne jêhatî
- Pozbilindî:** Bo mirovê qure tê gotin (Kibirli)
- Serhişkî:** Kesê bi inyard û dereng têdigihêje
- Serjinik:** Mêrê ku wekî jinan tevdi-gere, (kılıbık)
- Stuxwarî:** Belengazî, rebenî
- Zikzerî:** Kesên ku mirov gelekî jê bêzar û aciz dibe.
- Zikreşî:** Fesadî û xêrnexazî
- Zimandirêjî:** (Geveze, herkesê dil u-zatmak)
- Zimankurfî:** Kesên suçdarbûn

MEMED SERHEDÎ

Mamoste

NEJDET BULDAN



E-mail: oramarbuldan@online.de

Li rojhelatê Kurdistanê, herêma Şîno (Eşneviyê) mala Qaq Mîrza Selîm maleke ketxuda, xwedî zevî û malet e. Zarokên dibistanê li malê zêde ne. Jinên malê ne xwende ne. An jî hemû zanîna wan li ser gundê wan e. Ji rênçeriyê û maldariyê zêdetir tu têgehiştina wan nebû. Belê di mala wan de berq (elektrik) heye û mamosteyeke veşartî. Jin ji dengê Xelîl Xemgîn digihîne canejiniya xwe. Zarok ji programa Rindo hez dikin. Xort bi Siyabend re diçin serê Sîpanê û dibin jinrevayî û nêçîrvan. Keçên malê carinan gerîlan e li serê Çiyayê Cûdî, carinan jî evîndar in li Birca Belek. Zilam jî ji giftû-goyên siyasî û dîrokî hez dikin. Dema Şêrko Bêkes helbestan dixwîne navsaliyên malê diçin Silêmaniye heya Hewlêrê. Carinan jî li dîwana Şêx Seîd, li bajarê Pîran şer dikin. Û ya herî girîng, dizanin ku Kurdistan ne tenê gundê wan e.

Li çiyayê Elegezê, mala Casimê Heqo. Gelek tiştên di çîrokan de bûne rastî. Hemû Çarşembiyên Reş diçin pîrozbahiya Laleşa

Nûranî. Li Çiyayê Şingalê oldarî, li Helepçeyê komkujiyan dizanin. Berê Qers û Agirî di helbestên dilsojiyê de bûn. Niha carinan ew diçin Wanê. Carinan jî Qers li wan mêvan e. Dizanin ku ne tenê Çiyayê Agirî, ermen û rûs hene, Efrîn û Qamişlo jî welatê wan e.

Li Kobanê nasnameya Babê Memo û malbata wî tune bû. Wî xwe sêwî û bêkes dizanî. Keda wî ji bo Şamê, zanîna wî ji tîrsa Muxabarate bû. Di germiyana de kezeba wî şewitîbû. Paşê şareza bû ku li çiyayên Zagrosan pezkûvî, li zozanên Feraşînê kevîyên befrê û avên sar hene. Ew bi xwe kal bûbû. Memo şande welatê xwe yê zozanan û kuhistanan.

Li Diyana dayîka Hejar tenê guhdariya Kavîs Axa û helbesta Şêx Mehmedê Berzencî dikir. Niha dizane ku Hejar, li geliyê Quto li ser dewsa Seyîd Riza şervan e.

Petros li Fransayê hate dinyayê. Ew jî dizane ku Betnahrîn welatê wî ye. Li Amerîka neviyên Surme Xanim serpêhatiyên bapîrên xwe yê Patrik Mar Şemûn baş dizanin.

Kendal û Zelal ji herêma Şerefdînê ne. Lê li Belçikayê ji dayîk bûn e. Mamosteyê wan yê dibistanê fransî û flamanî nişa wan dida. Ew niha bi kurmancî û zazakî dizanin.

Gelo Petrosê Keldanî li Fransayê, neviçirkên Mar Şemûn ên Amerîka, Kendal û Zelalên li Belçîka, li Diyana Hejar û dayîka wî, li Kobanê Babê Memo, Casimê Heqo li Çiyayê Elegezê, malbata Kak Mîrza Selîm li

Şîno van hemû tiştan çawa zanîn? Di navbera wan û welatên wan de sînor, dewlet û dagirker hebûn. Di mejiyê wan de jîbîrkirin û helandin hebû. Ew biyaniyên zimanê xwe, dîroka xwe, cih û warê xwe bûn. Helbest û govendên xwe, serhildan û serpêhatiyên xwe ji bir kiribûn. Mamosteya wan MED-TV bû. Ku wê mamosteyê dikarî bikeve hemû mal û mêjiyan.

MED-TV ne tenê televîzyonek bû. Mêvaneke xweştivî û zanyareke birêz bû. Xort û kal bû, jin û mêr bû, zanîngeh û govend bû.

Kurd, suryanî, ermen û gelên dîtir, şareza-yî heqîketeke din jî bûn. Dema pirsgrînga Kurdistanê tê holê, nixêr nawneteweyî jî radibin. Tu peyman, rêbaz û têgehiştinên nawnetewî li ser lingên xwe namînin. Difelişin. Zagon, hiqûq û peymanên nawneteweyî dikevin bin bandora mark û dolaran.

Niha ew mamoste hatiye girtin. Di tarîtiyêke hov û bêqanûnî de ye. Bi xwînê hatibû avakirin, bi lîstikan hatî girtin.

Lê dijmin dîsa xwe û gelê xwe dixapîne. Kêfxweşiyên ji xwe re çêdike. Bila çend rojan kêfa wî li dar be. Ez bawer dikim ku, dema bizane roj û ronahiya wê bi bertil û xîl-baziyên nayê reşkirin, dîsa dê roja wî tarî bibe. Kurd bê xwarin dikarin bijîn, lê bê mamoste na. Emê dîsa dibistana xwe vekin, em jî hinî ronahiye bûn.

11 salên têr serpehatî û têkoşerane:

M. Selim Suncak*

Hevalê Hesên (M. Selim Suncak) di sala 1960'î de li gundê Tinatê bi ser Nisêbînê ve ji dayik bû. Malbata wî xizan û feqîr, bavê wî bi destekî bû. Xwişk û birayên wî, ji ber feqiriyê koçî Îzmîrê kiribûn. Hesên, li ber destê bavê xwe dima û karê malê hemû li ser milên bû. Lewre Hevalê Hesên hê zû ked û kedkarî nas kir. Hevalê Hesên mirovekî beşerxweş û devliken bû. Ew, pir bi hevalên xwe re girêdayî bû û her di ber hevalê xwe re cangorî dikir. Her ku diçû ber karik û pêz, yên cîranan jî bi xwe re dibirin. Lewma her kesî hez jê dikir.


Di sala 1989'an de bi xurtbûna Partiyê re Hevalê Hesên jî têkoşîn nas kir. Xwendin û nivîsîna wî pir kêr bû. Salekê an jî du salan dibistan xwendibû. Her tim dixwest bi hevalan re bikeve perwerdehiyê. Li ser têkoşînê bi hevalan gotûbêjan dîvêdirêj digerdandin. Piştî van gotûbêjan kêmasiyên xwe diditin û lê dixebitî ku wan sererast bike. Dema heval dihatin gund, xwe digihand cem wan. Pir bala xwe dida hevalan û li wan guhardarî dikir. Lijneya herêmê, li gundên herêmê digeriya. Li gundê Hevalê Hesên jî li jneya gund hate danîn. Wî jî di nava li jneyê de cih girtibû. Piştî vê yekê bêhtir bi Partiyê ve hate girêdan.

Carekê bû dilê axa

Zivistanê dema gundî li hev rûdiniştin, dest bi galegal û latajotinê dikirin. Lê Hevalê Hesên dema li civatê hazir dibû, behsa rojeva şoreşê dibû. Hevalê Hesên her tim bi li jneya herêmê re li gundan digeriya. Ew, her dem li ser perwerdehiya ciwanan difikirî. Ketibû taya peydakirina piştgiriya hêza ciwanan. Ciwanan piranî bi xar û qurîşê dilîst. Hevalê Hesên digote wan, ev tiştên bêkêr in, tiştên jê girîngtir hene. Piştî demekê wî listîna xaran qedexa kir.

Êdî Hevalê Hesên nema vegeriya gund, çalakiyên xwe ji derveyî gund dimeşandin. Di wê demê de, di navbera Partiyê û KUK'ê şer derket. Hevalê Hesên bi xwe jî li dijî KUK'ê şer kiribû. Piştî ku şer rawestîya, KUK'çian bi bêbextî Hevalê Hesên li Nisêbînê dil girt û radestî Hesên Axa kirin. Berî wê demê Hesên Axa ji aliyê hevalan ve hatibû gulabarankirin û birîndar bûbû. Ji vê yekê li dijî Partiyê neyartiyêke dijwar dimeşand. Li derdora Axê sih-çil çete û tîrşikçî civiyabûn. Ev kes li benda fermana Axê bûn ku Hevalê Hesên bikujin. Axa ji hevalê Hesên re dibêje: "Dev ji vê dozê biqere, em dê te berdîn." Hevalê Hesên jî dibêje: "Ez dest ji Partiya ku gelê kurd azad û serbixwe bike, naqehirim. Hûn min berdîn, ez dê herim cem hevalan. Çi ji we tê bikin!" Axê lê dinihêre ku nikare Hesên radest bigire, serbest berdidê.

Piştî ku Hevalê Hesên hate berdan, ew di sala hate nava hevalan. Êdî Hesên tîkiliyên xwe bi temamî ji malbatê birîn, 24 saetên xwe bi têkoşînê ve girêda û meşand. Piştî serdariya Cûntaya 12'ê



M. Selim Suncak (Fermendar Hesên) 11 salan şervaniyê dike û sê caran birîndar dibe. Ew digel ku tenê du salan diçe dibistanê jî, xwe gelekî bi pêş dixwe û dibe fermendar.

Rezberê Hesên û bi komek heval derket derveyê welêt û çûn Bekayê. Piştî ku du salan perwerdehiya leşkerî û ranyarî dît, vegeriya welêt û hat herêma gundê xwe. Lê Hesên ji hêla leşkerî û ranyarî ve xwe pir bi pêş xistibû. Bi heval û welatparêzên kevn re, ji herêmê û hetanî metropolan tîkîlî danîn.

Ji bo ku Hesên xwe bigihîne welatparêzan û gel, xwe dikir her şiklî. Rojekê diçe mizgeftê, di nav gundiyan de nimêjê dike. Gundî hemû ji mizgeftê derdikevin, Hesên û mele tenê dimînin. Mele nasê Hesên e, lê wî nas nake. Mele xwe ji tîrsa diştexilîne. Hesên dibêje: "De we re mele... ku em herin mal." Li ser vê, mele ji tîrsa şaş dibe. Peyre Hesên dibêje mele: "Netirsel! Ez ne biyanî me, dost im." Dawiyê mele Hesên nas dike û diçin malê.

Hevalê Hesên ewqas li derdora gundê xwe geriya, lê rojekê jî neçû mala xwe, xwe bi dê û bavê neda naskirin. Rojekê bavê Hesên li nav rezê xwe bû. Hevalê Refîk bi hevalê Hesên re li cem bavê Hesên bû. Hevalekî ji bavê Hesên pirsî: "Mamê Hecî ma tu zarokên te tunene, ku tu bi wê kalîtiya xwe kar dikî." Bavê Hesên dibêje: "Lawekî min hebû mîna we derket nav telebeyan. Ez nizanîm sax e an mirî ye." Heval gotê: "Ma ku tu Hesên bibînî tu yê nas bikî?" Bavê Hesên got: "Ev çend sal in min neditiye. Ma ezê ji ku nas bikim." Hevalê Hesên li wir xwe bi bavê xwe nade naskirin û veqetiya. Piştî ku veqetiyan û şûn de, hevalekî Hesên rexne kir û gotê: "Çima te xwe bi bavê xwe neda naskirin." Hesên gotê: "Bavê min nizane derewan bike. Her roj serbaz wan dibe qereqolê, ku jê bipirise ma te lawê xwe ditiye? Wê bavê min bibêje: 'Belê min ditiye'. Ji ber vê yekê min xwe bi bavê xwe neda naskirin." Hevalê Hesên rojekê bi milîsekî re silavan ji bavê xwe re dişîne. Bavê Hesên dibêje: "Silavên wî li ser çavan. Lê ku lawê min be, wê bê guhê ... jê ke." Milîs vê meselê ji Hesên re dibêje, Hesên dibêje: "Em ketine taya qezenckirina

însanan, bavê min dibêje: 'Were guhê ... jê ke'."

Sê caran birîndar bû

Hevalê Hesên li gelek heremên Kurdistanê xebat kir û bi awayekî neyê hejmartin, bi dijmin re kete tûşê (çatîşma) û cerdî ser dijmin kir. Gelek caran ji xefik û kemînen dijmin filitî. Sê caran di tûşê de birîndar bû. Cara yekemîn li Şirnexê, cara duyemîn li Midyadê, ya sêyemîn di sala 1987'an de li Nisêbînê li gundê Mûştîne, heval civîna herêmî dikin. Heval hîn di civînê de bûn, xayîne Ehmedê Şêxê ji nav refê hevalan direve û bi hezaran leşkerî tîne ser wan. Dijmin hevalan dorpeç dike û di nav wan de tûş derdikeve. Li wê derê pênc heval şehîd dikevin. Hevalê Hesên jî birîndar dibe. Xwe bi zikişkê, di nava pezê şivanekî ve dikişîne gund. Dijmin bi dû rêça xwîne de diçe gund. Lê berî ku dijmin bigihêje gund, Hesên birîna xwe derman dike û ji gund derdikeve. Lê di sala jî dijmin şopa xwîna wî dibîne û dide pey şopê. Di nav Hesên û dijmin de tûş derdikeve, hetanî ku tarî bikeve erdê. Peyre Hevalê Hesên ji cihê şer vedikişê û xelas dibe.

Taybetiyêke Hevalê Hesên a din jî, yazdeh sala di nava şerê çekdarî de ma, rojekê xwe bi dê û bavê xwe neda naskirin û bi wan re nehate dît. Qet berjewendiyên malbatê nedixist pêşiya berjewendiyên Partiyê û gel. Xwe ji hêla girêdana malbatê ve azad kiribû. Di nav şer de hatibû qusandin. Ji hêla ranyarî ve jî, ji rewşa gel fêr dikir û ji tengasiyên gel re dibû çareserî. Hevalekî sernerm, bêhnfireh, zarxweş, bi mezinan re mezin, bi zarokan re zarok û cengawer bû. Ji vê yekê, mirovên herêmê pir jê hez dikirin û lê guhdar dikirin. Sala 1989'an de, di Lijneya Eyaleta Mêrdînê Herêma Duyemîn de cih girtibû. Peywîra ferdariya hêrêmê girtibû ser xwe. Hevalê Hesên kir ku gelek cerdevanên herêmê çekên xwe deynin. Bi vî awayî dengê Hesên bi serfirazî û cangorî belav bûbû û di hate zanîn. Ji zarokên biçûk bi-

gire hetanî kal û piran, ku mirov digot Hesên, dikaribûn bi rojan qala wî bikin. Ewqas xwe bi wan dabû hezkin.

Hevalê Hesên û koma wî li Midyadê bi dijmin re dikeve tûşê. Dijmin bi hêzeke giran bi ser wan de diçe. Sê rojan tûş berdewam dike. Hesên bi du hevalên xwe ve tê Nisêbînê. Li wê derê jî livbaziyekê dikin û diçin mala hevalekî xwe. Hinek pêdiviyên xwe pêk tînin û ji gund derdikevin. Birayê hevalê wan jî, bi wan re derdikeve hetanî derveyî gund. Dinêrî ku dijmin wan teqib dike. Ji vê yekê, kesê gundî nikare vegere gund. Ji neçariyê heval dibêjin: "Îşev bi me re bimîne. Sibê vegere mal." Her çar heval tîne li hemberî gundê Hatxê dikevin stargehê. Wexta ku dikevin stargehê dijmin wan dibîne. Sal 1990, sisêyê meha remezanê bû. Dijmin derdorê stargehê bi tanq û topan dorpeç dike û di kozikan de cih digire. Haya hevalan ji tiştêkî tune ye; li benda sibehê ne ku mirovê gundî bişînin mal û dest bi kar û xebateke nû bikin.

Bi şhadeta wî serhildan li dar ket

Fermendarê artêşa şerê taybetî, bi dengekî qure û ji xwe bawer dibêje: "Terorîstno radest bibin! Me hûn dorpeç kirine." Wexta wiha dibêje Hevalê Hesên di kêleka stargehê re serê xwe derdixe, lê dinihêre ku dijmin derdora wan girtiye. Heval ji bo ku naxwazin yê gundî tevî wan şehîd bikeve, dibêjine wî: "Emê te tazî bikin û derkeve. Ku ji te pirsîn, bibêje 'Bi zorê ez revandim. Hûn dibînin kincên min hemû ji min kirine.'" Mirovê gundî naxwaze derkeve, lê nikare bi ya hevalan neke. Xwe tazî dike û xwe diavêje ser devê stargehê. Bi derketinê re dijmin le direşîne û birîndar dibe. Yê gundî dibêje: "Ez ne terorîst im. Ez bi zorê revandime." Hesên û hevalê xwe dijmin baş nas dikin, bi rewşê û hovitiya wî zanin. Radestbûn qet nayê bîra wan. Her sê heval li hev dinihêrin û xwe diavêjin stûyê hev, xwe li hev dipêçin, hev têr maçî kirin û şûn de ji hev re dibêjin: "Serkeftin" Her sê heval çekên xwe dişkênin û bi hev re dibêjin: "Berxwe-dan Jiyan e. Bijî Serok Apo. Bijî Serxwebûna Kurdistan." Hevalê Hesên devê demançeya xwe dike bin argûşka xwe û lingê wê dikîşîne. Her dû hevalên din jî çembilê narîncokê dikîşînin û xwîna her sê hevalan tevîhev dibe.

Piştî şhadeta Hevalê Hesên û mirovên wî û gel cendekê wî bir Tinatê. Bi bihîstina şehîdketina Hevalê Hesên re ji Kerboran, Nisêbîn, Hezex, Mehsert û gundên derdorê, gel bi jin û zarokan ve, kincên xwe yên rengereng li xwe kirin û xwe xemiland. Bi qamyon, teksî û dolmîşa hatin ser gora Hevalê Hesên. Hesên li ala Partiyê pêçan, bi lîlandin, govend û dilanê wan ew kir nav kerwana şehîdan.

HALİL KURT /Girtîgeha Aydinê

*Fermendar Hesên

Li Navenda Çanda Mezopotamya ya İzmirê

● 01.05.1999 şemf

1'ê Gulanê Cejna Karker û Kedkarên Cihanê tê pîrozkirin

● 02.05.1999 yekşem

Konsera Koma Tofan, saet: 17:00

Li YÇKM'ê ● 02.05.1999 şemf Film: Salvador,

Derhêner: Oliver Stone, saet: 16:00

● 05.05.1999 Çarşem, Film: Robîn Hod

Derhêner: Cevine Coster, saet: 19:00

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li BEKSAV'ê

● 03.05.1999 Dûşem

Film: Jude

Derhêner: Michael Winterbottom

● 05.05.1999 Çarşem

Film: Sînemaya Bihuştê, Derhêner: Giuseppe Tornatore


saet: 15.30 û 18.00

● 07.05.1999 In Film: Birayên Cervî, Derhêner: Gianni Puccini,

saet: 15.30 û 18.00

Di Mihrîcana Fîlman de: Fîlmên Îranî bûn

'Şêrinê ber çavan'



Tirkiyeyî û kurdistanîyên bakurî, ligel ku sî-nema, wêje û hunera rojavayî "heta heft baren xwe" dinasin jî, wêje û hunera rojhilatî "bi qasî misqalê zer" jî nas nakin. Tiştê balkêştir, naverok û tevna roman û fîlmên rojhilatî bi her awayî bêhtir nêzikî jiyana û berbora kurd û tirkan e. Nasnekirina huner û wêjeya rojhilatî, bes bi kêmsarezayî û pêşneketina cureyên nûjen ên wêje û hunera rojhilatî ve ne girêdahiye. Her wiha zihniyeta oryantalist û neteweperest jî, rê li ber danûstandina gelan digire. Bo nimûne di hin biwêjên tirkî de ev helwest xweş diyar e: "Ku min jê tiştê fêhm kiribe, ez bibim ereb", "Mîna porê ereban bû" hwd.

Lê xuya ye ev zihniyet û pêşdarazî hêdî hêdî tê şikêndin. Ev yek bi fîlmên îranî, di Mihrîcana Fîlman a Stenbolê ya 18. de cardin berbiçav bû. Lewre jî di vê mihrîcanê de fîlmên îranî bûn "şêrinê ber çavê" bîner û temaşekaran. Gelek kesan jî ber ku bilet peyda nekirin, nekarî li fîlmên îranî temaşê bikin.

Di vê mihrîcanê de, ku dê heya 2'ê gulane li dar be, 8 fîlmên îranî hatine pêşkêşkirin: Jina Gulanê (Rakhshan Banî-Etemad), Mala Hevalê Mîna Li Ku Ye (Abbas Kiarostamî), Ji Nêzik ve (A. Kiarostamî), Û jiyana berdewam e (A. Kiarostamî), Çêja Gilyazê (A. Kiarostamî), Sêv (Samîra Makhmalbaf), Reqsxa Xubarê (Abolfazl Jalîlî), Leyla (Dariush Mehrjui).

Di nava van fîlman de fîlmên ku herî zêde balê dikşînin ên Abbas Kiarostamî ne. Kiarostamî wekî yek ji baştirîn derhênerên cihanê tê binav-

kirin.

Di fîlmên Kiarostamî de, wekî gelek derhênerên rojhilatî, tevna film li ser derûniya mirovan, arîşeyên malbatî û hezkirina jiyane tene rêstin. Bi taybetî zarok û derûniya zarokan, di fîlmên derhênerên îranî de cihêkî taybet digire. Bo nimûne fîlmê "Mala Hevalê Mîna Li Ku Ye" li ser derûniya zarokan şaheserek e. Dîsa fîlmên "Sêv" û "Reqsxa Xubarê" der barê diwariyên li ser zarokan û hezkirina wan hatine saz kirin. Ev taybetî li cem hemû derhênerên rojhilatî peyda dibe. Her wiha di wêjeya rojhilatî de jî cihê zarok gelekî girîng û karîger e. Her çend, ji ber ku derhênerên rojhilatî nikarin li ser bûyerên siyasî filman saz bikin, bêhtir bala xwe didin ser jiyana rojane û derûniya mirovan jî, li aliye din jî zarokati jî ber ku li rojhilatê sext û dijwar e, ji bo derhêneran mijareke balkêş û hêja ye.


Li aliye din taybetiyên belgeyî yê derhênerên îranî jî darî çav dibe. Carna dirûvê belgefilman li filman dikeve. Lê ev yek wekî pine xuya nake û bîner xwe li film berdide. Wekî din ligel kêmdarfetiyê, fîlmên îranî di warê dîmensaziye de serketî ne û mirov pê ditamije.

Fîlmên îranî berî hemû neteweyan bo kurdan girîng û hêjayî temaşekirinê ne. Lewre jî zimên bigire heya dirûvê mirov û avahiyan tîneke kurdewarî jê difûre. Her wiha film bi vî rengî wê hemdilî û hevgeriya gelan xurt bikin û rê li ber danûstandinê vekin. Piştî temaşekirina filman, tu dibê qey mirov "birayê xwe yê windakirî" dîtiye.

MAZLÛM DOĞAN

ÇAVDÊRÎ

Dimeşim, li bin barana ji êgir...



SERKAN BRÛSK

Ezman tarî ye. Cihanê xwe bi derbekê re girtiye. Ber çavên min di tarîtiya tariyê de tarî bûye, mîna teniya Muşê reş bûye.

Ji min û wir de dawî ye. Li qiraxê me. Dimeşim bi meşa dildarekî serlêgeriyayî. Ji hev dernaxim rîyan. Hemû rê li ber min, li hev hatine pêçan. Min serê ta ji destê xwe berdaye. Rê pêş min nakin çik û çirûskên Kawa. Çirûskên wî di tarîtiya demê de reş dibin mîna bextê mirovahiyê.

Destên xwe di tarîtiyê de dipelînim. Tarîtiyê diqelêşim. Rûreşiya zemên bi çavên dilê xwe dibînim. Bi tena serê xwe me. Lê li hemberî zemên ji ya xwe nayem xwarê, serhişk im, mîna Kawayan.

Xwe li defa singê sînoren tarîtiyê didim, lê jê mîna berikekê dipengizim. Di xelesa mirinê de hatime girtin. Xelek li ser xelekê davêjin bedena min. Striyên sînoren azadiya min di giyana min de dieliqin. Wê didirînin. Birîndar dibim. Birîna min ya jiyane ye, ya cihanê ye.

Ez dilê bibirîn yê cihanê me. Zimanê kul yê biêş im. Zimanê dirêj yê êş û birînan im.

Ji min diniqutin dilopên sor. Firat û Dicle sor diherikin. Sorava wan min li ber xwe dibe. Em diherikin dilê cihanê. Derî li ber me tene girtin. Şingîniya çengelên deriyên wê di mejiyê min de olanan dide.

Serê min li tehtë dixin, bedena min ji hev vediciirînin, dergevanên azadiyê. Min bernadin. Bi min ve dizeliqin mîna ziloyan. Xwîna min dimijin mîna qirniyan. Mîna meşkekê dinepixin.

Cihanê ez ji rûyê xwe avêtime. Lê min xwe ji rûyê cihanê hîna neavêtiye. Min xwe neşemirandiye. Dimeşim, lê bi birînan pir diêşim.

Ez pêçayîme, bi tîlên strîkirî. Mîna masiyê di torê de eliqiyî, pêçayî me. Piyên min ketine nava çiravê. Teverger min bêzar dike. Diêşim lê dîsa jî, dimeşim û tevdigerim.

Ezman tarî ye.

Bi ewrên tarî seyandî ye. Baran dibare, bi şelpîn e. Dibare bi ser serê min de. Xwe li min vala dike. Bêhna xwe li min berdide. Min li ber xwe dibe. Dixwaze min di nava xwe de bifetisîne, mirar bike.

Di navberê de bi berq û brûskan tepiskan li nava serê min dide. Findoqan ji serê min dide, bi teriz û teyrokên xwe. Hebên xwe li serê min diceribîne. Şînahiya bihara min dipertîne. Xezeb e ya ku ew dixwaze bi serê min de bîne. Xezeb e ya ku rehm tîne serê min.

Baran agir bi serê min de dibarîne. Kizîni jî dilê min radike. Baran agirê di dilê min de gur dike. Barana agir e ya ez li binya wê dimeşim. Xaka di bin piyê min de dihelîne. Piyên min dipertîne. Bi van piyan dimeşim, reqîniya hestiyên xwe di kevçika dilê xwe de dibihîzim, lê dimeşim. Bi kaşîkê sergermiya xwe ve hildikişim.

Dimeşim li binya wê rehmê. Di nava tiliyên min de çixareya min. Pelê wê ji pelên dîroka min, titûna wê ji kulîlka li gulîstana, Kurdistan dîlan, agirê wê ji şewata dilê dayikan. Hilmekê li çixareya xwe didim. Bi duxana xwe re, çend peyvên qedexekirî ku ji dilê min yê kizirî tîne, pif dikim rûyên zebaniyên tarîtiyê. Serê xwe radikim. Piyên xwe bi hêza roniyê ku min bi dirêjahiya hezar salan di nava bîra xwe de parastiyê, diavêjim tîrîtiya tarîtiyê û derbasî ronahiya roniyê dibim.

RADYOYA MIZGÎNIYÊ

LI TIRKIYEYÊ


Her roj şemî û yekşemê êvarî di navbera 20³⁰ û 21⁴⁵ an de li ser pêla navên (MW) 864 kHz

Mizgînî, P.K. 1125
35441 Biebertal, Elmanya

LI EWRÛPAYÊ

Her roj şemîyê (Sebtê) saet di navbera 20³⁰ û 21⁴⁵ an de li ser pêla navîn (MW), 864 kHz.

Rojnameger Mehmet Aktaş: Divê rojnamegeriya kurdî



İ. CAN DILBİRİN

Divê rojnamegeriya kurdî bikeve xetke neteweyî. Lewre divê xîtabî her çar parçên Kurdistanê bike. Ger di sedsala 21' an de, zimanê neteweyekê nebe zimanê ragihandinê û çapemeniyê, wê ew ber bi tunebûn û mirinê ve biçê. Lewre teqez divê zimanê kurdî bibe zimanê çapemenî û ragihandinê.

kurdî çi bûn?

□ Di van 10 salên dawî de, ji bo dîroka çapemeniya kurdan gavên herî mezin hatin avêtin. Çima ev pêşveçûn çêbû? Wekî diyar e, Tevgera Kurdan ya Azadîxwaz li bakurê Kurdistanê bi şêrê çekdarî yê gerîla, derfetên gelek mezin derxistin holê. Ev yek jê bû. Di van deh salên dawî de, mirov dibîne ku çapemeniya kurdan giraniya xwe dide ser enformasyonê yanî ragihandinê. Berî vê bi 10 salan mijara çapemeniya kurdan a bingehîn, danasîna Doza Kurdistanê bû. Yanî çapemeniyêke îdeolojîk û siyasî bû. Lê îro rojname, kovar û televîzyoneke kurdan jî heye. Ev weşan, bêtirîn giraniya xwe didine ser ragihandinê yanî nûçeragihandinê. Ji ber ku êdî Doza Kurdan tê nasîn.

Wekî din, dema mirov behsa rojnamegeriya kurdî bike, lazim e mirov navê rojnameyên ku bi kurdî têne weşandin, hilde. Lê li aliyê din, çapemeniya ku giraniya xwe dide ser Kêşeya Kurd û Kurdistanê, ku tê de kurd kar dikin, heye. Ew sazî, bi sermayeya kurdan hatine avakirin lê ne bi zimanê kurdî ne. Mesela Yeni Ülke, Gündem, Özgür Gündem, Özgür Bakış û îro li derveyî welêt Özgür Politika. Ev rojname bi naveroka xwe kurdewarî ne lê mirov bi her awayî nikare van wekî rojnameyên kurdan qebûl bike. Lê, bo nimûne rojnameya Welat, bi her awayî rojnameyêke kurdan e. Hemû elementên wê kurd in.

Belê, bi vê yekê ve girêdayî, hûn li welêt û li derveyî welêt rewşa rojnamegeriya kurdî, çawa dinirxînin?

□ Dema ez li Tirkiyeyê bûm, deh sal berê min li Stenbolê di çapemeniya tirk de dest bi rojnamegeriyê kir. Piştî min di kovar û rojnameyên kurdan de kar kir. Dema ez li Stenbolê bûm, hema bêje serê her mehê carekê ez diçûme Kurdistanê. Min bûyerên li wê derê dişopandin. Wekî tê zanîn, di van deh salên dawî de, gelek rojnamegerên kurd hatin şehîtkirin, ketin zîndanê û îşkence dîtin. Tiştê girîngtir, rojnameyên kurdan hatin bombekirin. Îro jî ev rewş kêr û zêde berdewam e. Lê tiştêkî din li wê derê hebû; germahiyeke mezin, heyecaneke mezin hebû. Li wir destê me bi rehetî digihiştê welatê me, bêhna şer dihate pozê me. Me mi-

rovên şoresger nas dikir. Em di nava gel de bûn, em di nava dilê bûyeran de bûn. Eva giştî ji bo rojnamegerêkî avantajên mezin in. Lê tengasiyên aborî û teknîkî hebûn. Zilm û zora dewleta tirk hebû. Dîsa jî ji rewşa niha ya Ewropayê hêsan û baştir bû. Ji ber ku li Ewropayê toreya kemilî ya rojnamegeriya kurdî peyda nebûye. Rewşenbîr û rojnamegerên kurd bi hûrbîni li bûyeran nanihêrin. Ez dikarim bibêjim, perspektîva rojnamegerên kurd li welêt û Tirkiyeyê firehtir e. Lê MED TV'yê pir tişt guhert.

Baş e. Kêmasî û arîşeyên çapemeniya kurd ên herî girîng çi ne?

□ Kêmasiya herî mezin, siyaseta çapemeniyê başbaş nehatiye rûniştandin. Toreya çapemeniyê di van deh salên dawî de çêbûye, lê hîna neketiye xetke neteweyî. Lewre divê çapemeniya kurdî bikeve xetke neteweyî.

Lê bi baweriya min tengasiya herî mezin, perwerdehiya mirovan e. Çapemeniya kurdî teknîkeke gelek pêşketî bi kar tîne. Lê tevî teknîkê, giraniyê nade ser perwerdehiya mirovan. Lewre divê ji bo pêşveçûna rojnamegerên kurd, em bikevin nava hewldaneke mezin.

Bi dîtina we, rojnamegerî ji bo neteweyekê tê çi wateyê?

□ Niha sedsal 21'an, wê bibe sedsala ragihandinê. Mesela beriya ku şerê li Kosovayê rû bide, NATO û Emerîkayê êrîş bir ser Belgradê. Şerê li wir di CNN'ê de dest pê kir. Bi kurtayî çapemenî wekî boriya nefesê ya (zengelûra) neteweyekê ye.

Li aliyê din ger di sedsala 21' an de, zimanê neteweyekê nebe zimanê ragihandinê û çapemeniyê, wê ew ber bi tunebûn û mirinê ve biçê. Lewre teqez divê zimanê kurdî bibe zimanê çapemenî û ragihandinê.

Çêbû. Di vî warî de, MED TV ji bo kurdan tê çi wateyê?

□ Bêguman MED TV ji bo gelê kurd gelek tişt e. Yekem car e saziyê wekî MED TV'yê sînorê ji nava Kurdistanê rakirine. Ji aliyê din ve gelek hevalên me yên rojnamegerê ewrûpî ji MED TV'yê re dibêjin; "Kurdistan Virtual an Kurdistan Nîgaşî(sanal)" Bi baweriya min ev nixandî gelekî di

cih de ye.

Bêguman kêmasiyên MED TV'yê jî pir in, lê MED TV'ê di xetke neteweyî de weşana xwe pêk anî. Wekî din wê, şerê qirêjê li Kurdistanê raberî bû nerên xwe kir.

We behsa kêmasiyên MED TV'ê kir. Hûn dikarin diyar bikin?

□ Bi baweriya min, kêmasiya mezin, bernamêyên bi zimanê tirkî gelekî zêde bûn. Pêwîst e di pêşerojê de statên weşanê bi zimanê tirkî gelekî kêr bibin. Wekî hûn pê dizanin li bakurê Kurdistanê asimilasyona dewleta tirk zêde ye û bi milyonan kurd lê dijîn. Piraniya wan bi zimanê dayika xwe nizanin. Lewre jî divê MED TV weşana xwe bi bêtirîn tîxe xetke neteweyî. Lê ne tenê ji bo temaşekarên xwe yên li bakurê Kurdistan û Tirkiyê. Divê xîtabî her çar parçên Kurdistan û cîhanê bike. Divê hem weşana xwe li ser xetke neteweyî xurt bike û hem jî berê xwe bide cîhanê.

Puxteya gotinê; pêwîst e şexsiyeteke çapemeniya kurdî ya taybet hebe. Ez bawer im di vî warî de gavên girîng hatine avêtin û pêşveçûn hene. Ji Musa Anter bigire heta Mehmet Şenol, rojnameya Welat û MED TV ev tore berdewam e. Lê gerek e, her ku diçe çarçove berfirehtir bibe û destûrnameyêke (anayasa) çapemeniya kurdan bê nivîsîn. Lewma rêz û rêçikên çapemeniya kurdî ne nivîskî ne. Bi baweriya min, etîka rojnamegeriya kurdî çêbûye. Gerek êdî hin zagon û pîvanên me jî hebin û her wiha em bigihêjin standarteke navneteweyî.

Gelê kurd bêhtir hûn bi bernamêya "Ronahî"yê nas kir. Gelo çima evqas dilê kurdan bi "Ronahiyê" ronî dibe?

□ Ez dê çêli nixandînen bînerên Ronahiyê bikim. Kurdên li her çar parçên Kurdistanê û cîhanê li Ronahiyê temaşê dikin. Sedema wê ya yekemîn, Ronahî, li ser nûçegihandinê hatiye avakirin û bi zimanê kurdî, bi zimanê dayika me ye.

Wekî din gelek caran, em zimanê kurdî, wekî min got, bi tenê wekî zimanê muzîk, folklor û dîlanê dibînin. Lê ger em di warê dîplomasiyê, siyasî û hwd. de zimanê kurdî bi kar bînin, wê dilê gel bêhtir pê germ bibe.

Li aliyê din me bes mijarên tîkildan-

Birêz Aktaş, me 101. salvegera rojnamegeriya kurdî li pey xwe hişt. Ji hingî heta îro rojnamegeriya kurdî gihaye çi qonaxê?


□ Wekî hûn pê dizanin, di destpêka vê sedsalê de Kurdistan hate parçekirin. Tevgerên neteweyî yên kurdan serhildan dane destpêkirin lê hatin şkenandin. Lewma mîletê kurd kete nava bîdengiyêke dijwar. Lê îro em dibînin, di dawîya sedsala 20'an de, gelê kurd careke din li xwe vedigere. Hêza neteweyî ya kurdan, ger mirov bi çavêkî giştî lê binihêre, li her çar beşên Kurdistanê û li derveyî Kurdistanê bi qewet bûye.

Çapemenî jî, neynika mîletêkî ye, neynika dewletêkî ye. Bêguman îro çapemeniya kurdan, li gorî neteweyêke wekî kurdan bîdewlet, bêmaf gelek pêşketî ye. Bi salekê berî niha, ez çûme Qahîreyê. Dostê min Elî Bedirxan, ku ji malbata Bedirxaniyan e û li Misirê derhênerêkî navdar e, hinekî qala serpêhatiya Mîqdat Bedirxan kir. Bi pey agahiyên Elî Bedirxan, Mîqdat Mîthat Bedirxan rojnameya Kurdistanê di bin tengasiyên mezin de, di nava feqîrtiyê de yanî di tunebûnê de çap kiriye. Wî, gelek caran bi şev çûye kar kiriyê û rojnameya Kurdistanê çap kiriyê. Lê niha wekî hûn jî dibînin, em li navenda televîzyoneke kurdî vê hevpeyvînê çêdikin û çapemeniya kurdan gihîştîye wê qonaxê ku, televîzyoneke me ya peykê(uydu) heye.

Di van deh salên dawî de astengiyên ku derketin pêşberî çapemeniya

bikeve xeteke neteweyî

W Mehmet Aktaş di nava roj-nameyên tirk de dest bi roj-namegeriyê kir. Ew, girîngiyeke mezin di de zimanê rojnamegeriyê û wiha dibêje: "Divê zimanê kurdî bi tenê nebe zimanê lîstik, muzîk û govend e. Divê bibe zimanê jiyana modern û her wiha bibe zimanê ragihandin û informasyonê. Ma zimanê ragihandinê çêbûye? Bi baweriya min çêbûye. Mesela zimanê Azadiya Welat û kovarên ku li Swêdê bi kurdî derdikevin, ber bi standartbûnê ve diçe û rûniştiye."



Rewşa niha a Ewrûpayê hêsan û baştir bû. Ji ber ku li Ewrûpayê toreyeke kemilî ya roj-namegeriya kurdî peyda nebûye. Rewşenbîr û rojnamegerên kurd bi hûrbînî li bûyeran nanihêrin. Persfektîva rojnamegerên kurd li welêt û Tirkîyeyê firehtir e. Lê MED TV'yê pir tişt guhert.

beydullan bigire heya Îmraliyê. Ger em vî belgefilmî çêkin û bikin 2030 beş, wê bi milyonan kurd pê perwerde bibin. Lê ev kar ne karê kesekî an du kesan e.

meniya kurdî kemiliye an na?

□ Mixabin bi her awayî zimanê roj-namegeriya kurdî nekemiliye. Dema mirov behsa rojnamegeriyê dike, du tişt tene bîra mirov: Yek bi kîjan zimanî? Du, zimanê taybetî yê çapemeniyê. Mixabin niha bi taybetî li bakurê Kurdistanê, zimanê taybetî yê rojnameyê nayê bikaranîn. Ev kêmasiyeke gelekî mezin e. Mesela Azadiya Welat bi kurdî tê weşandin û li dora 45 hezarî tê firotin. Lê em dibêjin bi tenê li bajarê Stenbolê 3 milyon kurd hene. Li bakurê Kurdistanê 1520 milyon kurd dijîn. Lê çima evqas tê firotin. Ger mirov vê yekê bi tenê bi kêmanîna zimanê kurdî ve girêbide, ne di cih de ye. Her wiha divê rojname û kovarên ku bi kurdî tene weşandin, bi teknîkeke wisa bêne çapkirin ku, bala xwendevan bikşîne û zimanê kurdî bi wan bide hezkirin.

Wekî din pêwîst e ji bo perwerdehiya bi zimanê kurdî, di serî de MED TV, bikeve nava hewldanên mezin, da ku zimanê kurdî bi tenê nebe zimanê lîstik, muzîk û govendê. Divê bibe zimanê jiyana modern û her wiha bibe zimanê ragihandinê. Ma zimanê ragihandinê çêbûye? Bi baweriya min çêbûye. Mesela zimanê Azadiya Welat û kovarên ku li Swêdê bi kurdî derdikevin, ber bi standartbûnê ve diçe û rûniştiye. Wekî din di bernameyên MED TV'yê de zimanekî kemilî tê bikaranîn. Di bernameyên em çêdikin de hêdî hêdî zimanê kurdî ber bi zimanê televîzyonê ve diçe. Bêguman ev pêşveçûnên baş in.

Zor spas, da ku we dema xwe bo me terxan kir...

□ Ez jî spasiya we dikim û slavên xwe yên şêrîn bo xwendevanên Azadiya Welat dişînim. Her wiha divê em hemû xwendevanên Azadiya Welat, her yek ji me xwendevanekî nû peyda bike. Divê em tîraja wê bigihêjin 10 hezaran. Qet nebe berî sala 2000'î he-defa me ya biçûk ev be û em bibin roj-nameyeke rojane. Êdî piştî sala 2000'î rojnameyeke bi kurdî û rojane ji bo me şert e, li ku dibe bila bibe.

ketin, gotine me: "Em kurd in. Em ji e-şîra nizanî Mala Koroxlî ne." Van tiştan gelekî bala temaşekaran kişand. Bînerên me gotin: "Binêr! Kurd li Misirê, Pakistanê û li Urdunê jî hene." Ev ji bo kurdan tiştêkî nû bû û gelekî bala wan kişand.

Li aliyê din kurdên Qafkasyayê bi çand, ziman û hêviyên xwe gelekî resen û orjînal mane. Sed sal berê hinek klam û stranên kurdî ji xwe re birine, îro hîna jî ev tradîsyon(kevneşopî) berdewam e. Lê hîn bi pêş de çûye. Ez jî dixwazim bigerim lê ev daxwaza temaşekar e jî. Bi baweriya min rojnameger her tim di nava gel de ne. Rojnamegerî li ser maseyê tê kirin. Divê ev bibe daxwaza me ye ya duyemîn ne ya yekemîn.

Bas e. Ji bo pêşerojê we çi proje û plan heye?

□ Bi rastî ez jî başebaş pê nizanîm çendî bi rojnamegeriyê ve girêdahî ye lê ez dixwazim li ser dîrok, çand û jiyana kurdan belgefilmekî sînemayê çêbikim. Di van 34 salên dawî de hin hewldanên min çêbûn, lê hîna jî projeyên bi dilê min nehatine pê.

Bo nimûne; sedsal bi dawî dibe. Pêwîst e em belgefilmê sedsala 20'an ê kurdan pêk bînin. Ji Serhildana Şêx U-

Divê bi dehan rojnameger, bernamesaz û teknîker hebin. Ev xewnek e. Lê ez pê bawer im, siberoj ev belgefilm dê bê çêkin. Her çend evqas ne mezin bin jî, dusê projeyên min ên din hene û her wiha berdewamkirina Ronahî ye.

Piştî 101 salan hûn rewşa rojnamegeriya kurdî çawa dinîrxînin?

□ Pêşeroja rojnamegeriya kurdî bi pêşeroja Tevgera Neteweyî ya kurdan ve girêdahî ye. Ji ber ku hîn sermayeya taybet a kurdan neketiye warê çapemeniyê. Sermayeya taybet a kurdan heye lê hinekî qels e. Ez dinyaya wan biçûk dibînim. Yanî sermayedarên neteweyî yên baş ên kurdan peyda nebûne. Hîna xwendevan, temaşekar û rêxistin alîkariyê didin sazîyên çapemeniyê. Lewre ez dibêjim, wekî min di serî de jî got divê berpîrsiyarên sazîyên me, ji bo sedsala 20'an gelek projeyan hildin dest. Di serî de jî gihandina mirovên nû. Divê çapemeniya kurdî bikeve xeteke neteweyî. Ez jî bo pêşerojê bi hêvî me. Lê vê yekê, bi tenê rojnamegerên kurd ên profesyonel dikarin pêk bînin. Divê sazîyên me xwedî proje bin. Her wiha divê em rûyê vegeerînin sedsala 21.

Mirov dikare bibêje zimanê çape-

ri Ewrûpayê hîlnedan, li darê dinyayê çî tiştê têkilî kurdan bû mijara lêkolînên me. Me dil heye bûyerên nû bi nêrîneke neteweyî û zimanekî rewan û şahîk raberî gel bikin. Wekî mînak, cara yekemîn kurdên li Îsrailê di "Ronahî" yê de berbiçav bûn. Her wiha me bi navê "Bingeha Flamenko Dengbêjiya Kurdî ye" çêkiribû, ew bû mijara lêkolîna du zanîngêhên ewrûpî. Wan em dawet kirin.

Dema navê Mehmet Aktaş tê hildan, ji ber xwe ve kurdên Sovyetistanê tene bîra mirov. Ev têkilîdarî û hezkirina we ya bo kurdên Sovyetistanê ji ku tê?

□ Bernameyên dokumanter, belgefilm bi lêkolînên baş ava dibin. Bêguman redaksiyona Ronahî tim lê dixebite, da ku tevahiya bûyerên li darê dinyayê, ku li ser kurdan in, pêşkêşî temaşekarên xwe bike.

Karê em dikin ne ji bo min, ji bo temaşekaran e. Berî her tiştî em dibêjin: Em dê çawa bala temaşekaran bikşîmin? Lê bi raya min kurd dixwazî hevdu nas bikin. Serpêhatiyên hev hîn bibin. Ji ber ku gelê kurd ji hev pirtî pirtî bûye, ji hev belav bûye. Wexta me bername li ser kurdên li Misirê çêkir, kurdên ku wekî ereban xuya dikirin, der-

Xewnên bi zimanê biyaniyan

Her tim ku çavê wî bi qonaxa Xurşit Axa diket, hêrseke tolhilfî û nediyar diket ser dilê Kîrkorê "Gawir". Berî êvarê ku naxir ber bi çipilê Deşta Şatir Hoyuka ku di bin siya çiyê de xemilî de kir, ew qonax wekî hêlîna têrê baz li ser kulingê zinêr xuya dibû. Ji bo Kîrkor, mesûlê ev germa ku deştê diqewirîne, ew vizikên ku paş roavan li neslê însên dibin dujmin, ew çipilê ku siwaran bi lenîstok ve dadiqurtîne, koremarên ku bi çokê dayikên ku zarok li ber siya dara dimêjîne digire, çavkaniya zilma ku hemû malbata wî di çola erêb de bi osmaniyan dabû kalkirin ew qonax bû.

Her êvar ku naxir li nav hoxên xulaman belav dibû, dîre dinêrî û li ser wî parçeyek nanê ku xwedanên naxirê, bi bez didan wî difikirî. Di dilê xwe de li yê Çarhestî hêrs dibû. Ewê ku gotibû "lawê min" û Kîrkor ji dest leşkerên osmaniyan filitandibû...

Yê Çarhestî konê xwe yê reş û heşt stûn li kêleka gundê ermenan vegirtibû. Cara sifte ku Kîrkor Çarhestî ditîbû. Ew di hewşa wan a mermerî de bi bavê Kîrkor re rûniştibû û fîncanek qehwa fal vedixwarin. Wan bi hevdu re bi kurdî qise dikir. Nêzikî hemû ermeniyan zimanê kurdî dizanin. Lê kurdan wekî zimanê ermenyan, zimanê cîranên xwe nedizanin.

Dema ku koçerên kurd konê xwe li kêleka gundê ermenî vedigirtin, gund şên dibû, nêzikî du hefteyan mirov digot qey li nav gund cejn heyê!

Kurdan penêr, mast, rûn, lor û hwd. didan ermeniyan û ji ermeniyan qenewûç, sandix, qaw û qeçax, fraq, tiştên ku bi dest, bi huner dihatin çêkirin û mucewherat digirtin.

Navbera Haçîkê ermenî bi Çarhestiyê kurd re dost bû.

Dîsa koçer ji zozanan daketibûn deştê û konên xwe li kêleka gund vegirtibûn. Haziriya zivistanê dikirin. Payîz bû. Roj li ezmên wekî neynûka di bêrika ciwanan de dibiriqî. Ji aliyê Kômürlüyê ve keriyek siwar di nav toz û dûmanê de derket. Bayê xerbî dabûn paş xwe û ber bi gund ve dihatin.

Bavê Kîrkor, Haçîkê ermenî ku van çend mehên paşîn di nav gund de bi telaş diçû û dihat, dema ku Mifreza osmaniyan dît, dîsa tevî yê Çarhestî di hewşa mermerî de li bin dara hêjîrê qehwe vedixwar.

Haçîk haziriya şandina dibistanê ya lawê xwe Kîrkor, dikir. Dixwast Kîrkor jî wekî her du qîzikên xwe yên mezin bişîne Swîsreyê.

Kîrkor tekane lawê malê bû. Her du xwişkên Kîrkor li mal bi hev re bi fransî qise dikirin, ji bo ku Kîrkor wan fêhm neke... Kîrkor di dilê xwe de digot: "xwezî min jî ji zimanê tîlîmî fêhm bikira, belkî insan dikare.. hiqest tiştên balkêş û xweşik bibêje... Çi zimanekî xweş e, ez jî biçim dibistanê û vî zimanê nepen hîn bibim... Fîskosên xwişkên xwe fêhm bikim. xwişkên ku her tiştî ji min vedidizin.

Kîrkor heya niha encax bi zimanê ermenî û kurdî dizanî. Ew mêvanên ku ji welatên dûr dihatin ba bavê wî, kî dizane çi qas tiştên xweş û balkêş bi vî zimanê ecêbînin zimên!

Her tim dema ku mêvanên ji dûr dihatin mala wan, Kîrkor bi dilxweşî li kêlek mîndera bavê xwe, çenga xwe dida ser jûniyê bavê xwe û dixwast maneyên zarokî bide peyvên ku ji devê mêvanan diweşiyên. Dereng, bi şev ku ew di xew de diçû, serî li ser jûniyê bavê xwe, hemû xewnên wî bi wî zimanê nepen ku wî jê fêhm nedikir bûn. Kîrkor bi zimanê xewnên xwe nedizanî. Digot, "dema ku ez mezin bibim, ezê xewnên xwe tercû-



me bikim. Yek jî ezê sira fîskosên xwişkên xwe derxim holê.

Her tim ku Kîrkor zarokatiya xwe dianî bîra xwe wenyên ku di xeyala wî de mabûn di bin lingên hespên mifrezeyên osmanî de dibûn toz û dûman, torî û êbrûtî li hev û du diqelibî...

Bîranînên wî dibûn wekî wan xewnên wî yên bi zimanên biyanî. Herçî ku porê xwişkên xwe dianî bîra xwe... Ew porê ku mifrezeyên osmanî bi destê xwe dişidandin û di erdê re dikişandin, ji axûjehra hemû marên deştê zêdetir, êşek kûr xwe berî dilê wî dida. Cihêzên xwişkên wî, marik, mucewherat, destmal û ew tiştên zêr û zîvîn ên ku di sandoqa bi qenewûç û neqşa ku bi destê pîs û gemar hildiweşandin, dibû tîrên pozbijehr û lanetkirî û êşên giran xwe didan laş û dilê wî. Wênayê herî zelal ê zarokatiya wî rûyê dayika wî bû. Ew rûye ku li ber tava rojê rengekî paxirî girtî. Qirbaçî osmanî rûyê dayika Kîrkor kiribû du şaqan... Vîqe vîqa jinên ermenî qet ji guhê wî demediket. Tîrêjên rojê destên wî dilerizandin. Eger ku Çarhestî bi destê wî negirtibûya Kîrkorê dilê mifrezeyê bi neynûkan derxista, biguwaşt û xwîna ku dê jê dilop bikira vexwara.

Dema ku mifreze ber bi wî ve hatibû, Çarhestî bi tirkî bi mifrezeyê re peyivîbû û mifreze destê xwe nedabû Kîrkor. Bi salan şûn de encax bi ser vebûbû ku Çarhestî wê demê ji mifrezê re gotiye, "ew lawê min e".

Gundiyan ermenî bi benan bi hevdu ve hatin grêdan, di bin qirbacên mifrezeyan de li ewrên toz û dûmanî yên deşta germ qelibîn... Ewran, niha li ser dilê Kîrkor giraniyeke dûr û kûr hasil kiribûn.

Çarhestî bi destê Kîrkor girtibû û ber bi konên eşîrê ve diçû. Dema ku Kîrkor çû bin kon, zarokên eşîretê ew bi çavên wekî heyvê, bêdeng dawetî listika xwe dikirin. Ji wê rojê vir de Kîrkor jiyan wekî listikek zarokî hilgirte destê xwe.

Kî dizane, belkî du, belkî sê û belkî pênc payîz paşî ku dê û bavên Kîrkor bi hemû gundiyan re li xweliya deştê qelibîbûn û bûbûn ewr, telaşek mezin di konên

eşîrê de derket. Hîn çend roj berê heft hespên eşîriyan kurd tazî daketibûn deştê. Ji tazî daketina hespan hate fêmkirin ku heft peyayên kurd hatibûn kuştin... Yan jî tiştên xirab bi ser wan de hatibû. Hespên tazî dihatin vê maneyê.

Rîspiyên eşîrê ji dûr ve li hespan dinêrîn û bi çavên dûr û kûr difikirîn...

Dema Kîrkor fêhm kir ku biryarek muhîm hatiye girtin, bêkesiya ku heta niha di hundirê xwe de veşartibû ew bi kulîlkên dara hinarê re kire sirdaş. Di gêrkirina konan de Kîrkor fêhm kir ku ev koça ne wekî koçên din e. Ne dema zozanan bû. Ev koça bi rê ket, li rê rêz bû. Di wê teqereqê de kes ji tunebûna Kîrkor hayedar nebû. Wî xwe di nav diriyên de veşartibû û li karwanê koça ku bi dûr diket dinêrî. Koç di paş çiyayên bilîn de çal bû.

Êdî ew bi tenê bû. Dengê emeleyen ku li înaata qonaxa Xurşit Axa dişixulîn ew bi xwe hesand. Dema ku ew çû ser înaatê emeleyen xebat berdabûn. Bêhnvedana nîvro bû.

Bi xwe zembîl berda binê bîrê û av ji emeleyen feqîr re kişand. Kesî ji wî re qet tişt negotibû. Û tiştê jê pîrs nekiribû. Êdî herçî dema ku emele tî dibûn, bang Kîrkor dikirin û av ji wî dixwestin. Kengî ku dawî li înaata qonaxê hat Xurşit Axa ew dabû ser karê sakiyî (av wan) yê qonaxê. Bi salan karê sakiyî kir.

Ji ber ku Xurşit Axa di qirkirina ermeniyan de alîkariya dewletê kiribû, dewletê zeviyên ku serê sibê di bin siya çiyê de dimîne dabû wî. Serê sibê siya çiyê davête ser gundê Kîrkor jî. Kîrkor kal bû. Axê sakiyên ciwan girtin. Êdî Kîrkor naxirvanî dikir. Kîrkor li dû naxirê, giran giran dimeşiya û digot: Êdî bes e, de bila ew listik biqede, bila biqede!

Çend payîz derbas bûn kes nizane, Kîrkor di nav xewn û xeyalên marên ku li bin darên hinarê ku xwe bi kulîlkên xwe xemilandin bi listika evîne dilîstin ve çû. Deşt germ û zer bû. Pir wext derbas bûbû ku koçerên kurd venegeriyabûn.

Serokê Yûgoslavyayê Slobodan Mîloseviç:

Berî NATO'yê "tevgera cudaxwaz" ne çekdar bû

Divê bê zanîn ku li Sirbistanê 26 hindikahî dijîn. Albanî jî di nav de bi tu qewmî re arîşe derneketine. Arîşe bi tevgera cudaxwaz a albanî re derketine. Heta mirov dikare bibêje tevgera cudaxwaz jî berî NATO'yê çek bi kar nedianî.

BEŞA NÛÇEYÊN DERVE

Roja 26'ê avrêlê li ser navê Khou-TV'yê Dr. Hatchett bi Serokê Yûgoslavyayê Slobodan Mîloseviç re hevpeyvînek pêk anî. Ji ber ku çapemeniya hêzên împeryalîst cih da daxuyaniyên aliyê ser, em hinek xalên girîng ên hevpeyvîne pêşkêşî we dikin.

Serok Clinton we wekî qesabê Balkanan bi nav dike, ew we wekî şiflerekî nû û mirovekî din bi nav dike û herpirsiya hemû arîşeyên balkana pê re rû bi rû ne di-stûyê we. Hûn bi rastî wekî şexsî ne?

Hikûmeta we du şeran dimeşî- ne li hemberî Yûgoslavyayê û li dijî gelê me. Yek şerê çekdarî ye û yê din jî şerê medyayê ango şerê propagandayê ye. Şerê propagandayê berî çekdarî dest pê kir û armanca wê biçûkxistina welat, gel û serokatiya welatê me ye da ku gelê DYA bibe piştevane vê êrîşa çekdarî.

Şerê medyayê nişan dide ku amalekariyên wan ên ji bo êrîşê ji mêj hatine kirin. Lewre jî em qurbanîyên wan her du şeran in. Qurbanîyên şerê çekdarî gelê sivil ê welatê me bi xwe ye. Lê qurbanîyên şerê din ne bi tenê em in. Her wiha demokrasîya Amerîkayê jî qurbanîya şerî ye. Heke li welatekî rêveber derewan ji gelê xwe re bikin, ramana giştî li ser agahiyên derew pêk tînin, mirov li wî welatî nikare qala demokrasîyê bike. (...)

Li gorî Clinton sedema kêşeya navbera du welatan de nepejirandina peymanê li Fransayê ye. Çima Yûgoslavyayê peymanê navborî şanên nekir?

● We qala gotûbêjan kir, lê li Fransayê qet gotûbêj pêk nehatin. Di nava wan sê hefteyan de (du hefte li Rambouillet, hefteyek li Parisê) di navbera lijnayan de hevdişînek bi tenê jî pêk nehat. Lijnayên li wir nekarî jî hev re peyvekê jî bikin. Lewre mirov nikare çêlî gotûbêjan bike.

Îcar em bala xwe bidin lijneyê. Li aliyekê lijneya Sirbistanê heye ku



Silobodan Mîloseviç

nûnerên hemû civakên li Kosovayê di nava xwe de dihevine. Digel nûnerên sirban sê heb jî nûnerên albanîyan di nava lijneya me de cih digirt.

Li aliyê din jî lijneya cudaxwazan hebû. Ji mêj ve nêzîktêdayina me ya bo kêşeyê ev bû: Kêşeya Kosovayê dikare li ser bingeha wekhevîya gelan û hemwelatîyan çareser bibe.

Li herêmê sirb jî hene, 250 hezar sirb li wir dijîn û kalikên wan berî albanîyan li wir bi cih û war bûn. Kosova warê sirbiyan ê qedîm e, gelek perestgeh û cihên dîrokî yê sirban li wir hene. Li herêmê ne tenê albanî çarkek milyon sirb, 200 hezar misliman, 150 hezar misirî û 50 hezar tirk hene. Tevî ku tirk kêmtirî gelê herêmê ye jî dibistanên wan hene û bernameyên televîzyon û radyoyan bi tirkî jî tînin pêşkêşkirin. (...)

Li Rambouilletê hate xwestin ku em serxwebûna Kosovayê bipejirînin, ne xweserî (otonomî) ye. Ez bawer im kes tiştêkî bi vî rengî napejirîne. Em qala xweseriyê dikin, qala wekhevîyê dikin, em qala serxwebûna tevgera cudaxwazên albanî nakin. Di wê hevdîtîne de ev tişt hebû. Ew dixwazin di nava Sirbistanê de dewleteke serbixwe pêk bînin. Lê di nava Sirbistanê de ew hindikahî ne, li her derê Sirbistanê albanî hene.

Divê bê zanîn ku li Sirbistanê 26 hindikahî dijîn. Albanî jî di nav de bi tu qewmî re arîşe derneketine. A-

rîşe bi tevgera cudaxwaz a albanî re derketine. Heta mirov dikare bibêje tevgera cudaxwaz jî berî NATO'yê çek bi kar nedianî. (...)

Gelê Amerîkayê her roj di televîzyonên xwe de dûmenên trajîk ên penaberên albanî dibîne. Nete-weyên Yekbûyî dibêje heta zêdetirî 532 hezar kes ji Kosovayê hatine vederkirin û ew di bin mercên gelekî giran de dijîn. Gelo politîkayê we ya ji Kosovayê vederkirina albanîyan heye?

● Tu politîkayê min û welatê min nîn e ku tu hemwelatîyên xwe ji tu cihê welatê xwe veder bikin. Divê ez bibêjim ku dema bi Xirvatistanê re şer hebû, me hemû xirvatîyên li Sirbistanê parastin. Her wiha di dema şerê Bosnayê de jî me hemû misilmanên li Sirbistanê parastin.

Em ji hemû serdanvanên xwe yê biyanî re dibêjin ku Yûgoslavya mîna keke baş a nêzîktêdayina baş a li hemberî hemû hindikahiyên neteweyî ye. Li gorî me pîvana demokratbûna welatekî nêzîktêdayina desthilatdarên wî welatî ya li hemberî hindikahîyan e.

Heke em bînan ser pîrsa we, rast e gelek kes ji Kosovayê direvin, ne tenê albanî gelek kes direvin. Ev jî encama bombebaranê ye. Her kes direve; sirb, tirk, mitrib, misilman û tabî albanî jî, serjimara wan ji gişkan zêdetir e. Ne tenê mirov-hemû giyanewer ji ber bombebaran NATO'yê direvin. (...)

ÇEND NÛÇEYÊN LI SER KOSOVAYÊ

Pireyên ku neqediyane jî dibin bedefa NATO'yê

✓ Ji roja ku êrîşên hewayî yê NATO'yê dest pê kiriyê heta roja îro zêdetirî 30 pire bi bombebaran hêzên NATO'yê hatin rûxandin. Ji van bi hindikahî 3 heb bi 300-400 km'yî dûrî herêma Kosovayê ne. Tê gotin ku rûxandina van pireyan tu bandorê li şerê Kosovayê nake lê ziyaneke mezin dide gelê Yûgoslavyayê. Hinek ji van pireyan hê di rewşa avakirinê (însaat) ê de ne. Pireya li Ostruznica û pireya ku Kovin û Smederevo digihîne hev ji ber ku hê neqediyabûn bi tenê ji hêla kesên sivil ve wekî peyarê dihatin bikaranîn. Ji rûxandina van pireyan gelê sivil ziyaneke dibîne. Hêjayî gotinê ye ku 4-5 pireyên ku hatine rûxandin li navçeya ku Mîloseviç desthilatdariya herêmî wîndî kiriyê ye.

Nivîskar Harold Pinter şerka şermezar kirin

✓ Nivîskarê navdar Harold Pinter bi daxuyaniyekê êrîşên li ser gelê Kosovayê û êrîşên NATO'yê şermezar kirin. Pinter di daxuyaniya xwe de da zanîn ku NATO gelê Sirbistanê ceza dike û Clinton jî bi vî helwesta xwe ya xeternak bi qasî Mîloseviç sîcdar e. Da zanîn ku bi vî helwesta êrîşkar a NATO'yê derbeyeke kujende li Neteweyên Yekbûyî xistiye. Li gorî Pinter Clinton rîya nebixêr a Bush û Reagan dikudîne û Tonny Blair jî li ser şopa Thatcher in. Nivîskarê navdar Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê wekî hêzeke xeternak û jikontrolê derketî bi nav kir. Pinter bi bir xist ku bi gemaroya li ser Iraqê nêzîkî milyonekî zarokên Iraqî hatine kuştin û niha jî bi vî biryarê gelê sirb tê kuştin.

Gerry Adams: NATO durû ye

✓ Serokê Sinn Feinê Gerry Adams beşdarî civîneke "Ewlehiya Ewrûpa û Bêlayeniya Îrlandayê" bû di vî civînê de bal kişand ser durûtiya NATO'yê û xwest ku Kêşeya Kosovayê bi guftûgoyan çareser bibe. Adams Serokê Yûgoslavyayê Mîloseviç jî bi tundî rexne kir û ew wekî ihlalkarê mafên mirovan ê mezin bi nav kir. Serokê Sinn Feinê di dirêjahîya axaftina xwe de da zanîn ku kesên mîna Mîloseviç ji ber piştewaniya NATO'yê bûne xwedan çek û hêzdar bûne. Gerry Adams diyar kir ku dewletên mîna Endozneya û Tirkîyeya ku kurdan diçewsinê jî ji ber sersarî û durûtiya NATO'yê dikarin zilma xwe bidomînin. Adams xwest ku Îrlanda bêlayeniya xwe biparêze û nebe endamê NATO'yê.

Evîna Fatima Salih Axa û Mihemedê Mîrê Hoska (2)

Ez hesreta te
ne bîm mirinê

Wê demê Fatim bi serê lêvan di-
kene û bi dengê mîkewî bi
hawe diavêje ser lawkê şivan:
Ê de lo lo lawiko lo lo...!
Devê min nagere ez bêjim şivano!
Min tu car ne dîtiye û ne jî bihîstiye
Şivanan beran û nêrî, veğerandine ji bo
bêriyê
Ê de lo lo lo lawiko mêvano lo lo...!

Wê demê Mihemed dev lê ziwa dibe,
ji fediyani di xwe de dicemide û şeqiz di-
be. Careke din Fatim dest pê dîke:
Ê de begê min dilê min dibêyo
Ê de mîrê min dilê min dibêyo
Erê lawiko ez dên û bala xwe didimê
Lingên te ne lingên çaroxan e
Milên te ne milên kurk û kulavan e
Destên te ne destên dar û çovan e
Ay de lo lo lawiko mêvano lo lo...!

Erê lawiko ez dên û bala xwe didimê
Lingên te lingên zeng û qonderan e
Milên te milên abayê Besraniyan e
Xwezî te derdê xwe ji min re bigota
Gelo çima tu hatî ji bavê min re
Li vê çola hanê bûyî şivan e lo lo...!
Ay de lo lo lawiko mêvano lo lo...!

Mihemed wê demê tê derdixwe ku ew
Fatima Salix Axa ye. Lê, xwe qure dîke
û li xwe danayne, lê vedigerîne:
Erê xatûnê dilê min dibêyo lê!
Jixwe zozana bavê te bi jimare heye
Xatûnê van henek û tinazên xwe bi min
neke
Qey nesîbê min di nanê bavê te de tune-
ye
De ezê herim lê lê xatûnê lê lê!

Fatim dên û bala xwe didiyê ku ew la-
wikê xweşik pir delalî û nazik e û ji ber
van gotinên wê xeyidiye û wê here. Vê
carê xwe nerm dîke û li ber digere, dibê-
je:
Erê begê min dilê min dibêyo lo lo...!
Rast e zozana bavê min qat li me ye
Bi hezaran pezên bavê min bi jimar e he-
ye
Êvarê tu were pezê bavê min mexel ke
Tu berê xwe nede odeya axan û melan e
Rûnenê li ber wan e, guh nede gotinên
wan e
Ceneta wan ji te re lazîm nîn e
Tu şeva nivê şevê were di kozê de
Li taximê sing-û berê min karxezalê
Ji xwe re li ceneta rastîn mêze ke lo lo...!
Ay de lo lo lo lawiko mêvano lo lo...!

Vê carê Mihemed dibersivîne:
Erê xatûnê dilê min dibêyo lê lê...!
Lê lê xatûnê min digotî tu keça axan î
Lê, min nizanîbû tu qeşmera li destê şiva-
nan î

Evan karên tu dibêjî, tu tîkiliya min bi
wan tune ye
Duwanzdeh zarokên min li mal in,
çavên wan li riya min e
Ez hatim temîn bikim abora
zarokên xwe ye
Lê, ji ber evan gotinên te,
ezê herim bi xatirê we
ye lê
Ay de lê lê lê xatûnê lê
lê...!

Fatim biherse
dibê:
De here karê xwe lo
şivano lo lo...!
Ez Fatima keça Salih
Axa me
Kevokeke spî li
ser ban û xênîya
me

Sing û berê min wek zer şe-
mamokan e
Ne layiqê devê te yê genî, şî-
vanê pezan e lo lo...!
Ay de lo lo here karê xwe şiva-
no lo lo...!

Wê demê cariya Fa-
timê xwe diavê navê,
tîrsa wê di Mihe-
med de ye.
C a r î

dibê-
je:

Erê
xatûna min dilê
min dibêyo lê lê...!
Eyb û şerm e ji te
xatûnê ye
Ger bavê te bi e-
van gotinên te bihese
Qesem dikim wê poz û guhên te jêke
Wê te weke qerwaxekî berde navê lê ye lê...!
Ay de lê lê lê xanima minî lê lê...!

Fatimê, dên û bala xwe dayê ku zêde
here, wê carî here li ber bavê wê qelaçî-
yan bike û wê bavê wê hew bihêle ku ew
were bêriyê. Jixwe, ger Mihemed rast bi-
xeyide here, wê ew hesret hew ji dilê wê
derê.

Wê şevê ji ber bayê eşqê hiş û aqil di
serê Fatimê de nemabû. Fatimê, dil û aqil
avêtin ber qapanan û mêzînê, lê her tim
dil giraniya xwe diavêt ser aqil. Kete ro-
ja dinê, Fatimê careke din xwe xemiland
û da pêşiya bêrivanan ku careke din we-
rin bêriya sibehê. Lê, vê carê ka hela em



bi-
nihêrin Mi-
hemed çî kiriyê?

Hîn ku bêrî nehatine,
Mihemed ji şivanên he-
valên xwe re dibêjê: "Ezê
herim li wê mesîla hanê
xwe dirêj kim, ger bêrî-
van hatin li min pirsîn, bêjin,
Mihemed nexweş e."

Fatim û bêrivanan hêdî hêdî rê girtin û
hatin bêriya sibehê. Dên û bala xwe dan
ku Mihemed ne xuya ye. Aqil li serê Fa-
timê nema li çolê. Cariyan berê xwe dan
Fatimê gotin,, Agir bi mala bavê te ne-
ketê, hingî te serî da ser rebeno, ji destê
te neqedande. Êdî em nizanin ku rebeno
çû ku derê?

Fatimê, lez û bez kir, xwe gihande ber
şivanan û gote: "Hûn bidin xatirê
Xwedê, lawo ka bêjin ew şivanê duhîn ji
kîjan welatî bû û di kîjan rê de çû?
Lezkin ji min re hespekê veğerînin ez lê
siwar bim û bidim ser şopa wî."

Şivan dibêjin, "De xatûna me. Wele
devê me nagere em bêjin. Mihemed nex-
weşê bêhal e. Wa ye, li wê mesîla hanê
razaye."

Ewê demê Fatim weke pezê xwê xwa-
rîbe û xwe bikişîne ser avê, berê xwe di-
de mesilê, cihê Mihemed lê razaye. De-

ma çav berdide Mihemed, dibêje: "Wey
stûyê min bişikê, çavên min derên. Ez
vegerim bidoşim şîrê mihan. Bînim, ber-
dim qirika şivanê delal. Belkî bişîne şîfa-
ke xêrê Xwedanê rehman."

Mihemed, serê xwe radike, çavên xwe
vedike. Fatim cardin dest pê dîke:
Erê mîrê min dilê min dibêyo lo lo...!
Mihemedo dilê min vê sibehê dilekî tem-
e

Li vê çola hanê tu qusûrên min ef bike
Qey duh min ji te re çend gotin gotibûn
Dilê te ji min maye, loma tu nexweş î vê
rojê ye
Qesem dikim ger eslê te mirtib û qereçî
be
Cardin tu ser serê min û bavê min qebûl
î lo lo...!
Ay de lo lo lo de lo lo nexweşo lo lo...!

Ev car Mihemed dest pê dîke:
Erê lê lê Fatimê dilê min dibêyo lê lê...!
Konê mala bavê te mezin e weke xan e
Aliyek deşt e, yek zozan e
Di ser de girtiye mij û moran e
Xwedê xera ke mala pîrê
Digot, Fatima keça Salix Axa
Xweşikbûna wê bi nav û deng e, li ma-
la bavê xwe giran e
Sê rojên şivanan naqedin roja çaran tu
li dû wan î
Ay de lê lê lê xatûnê lê lê...!

Dema Mihemed van gotinan dibêje
evcar, Fatim xwe dixeyidîne. Mihemed li
ber digere, dibêje:
Erê lê lê Fatimê dilê min dibêyo lê lê...!
Konê bavê te mezin e weke xan e
Aliyek deşt e, yek zozan e
Bi Xwedê konê bavê min ji yê te bêtir e
Ez Mihemed im lawê Mîrê Hoska
Li ser gotinek pîrê, ketime ser rîyan û
dirban
Min li xwe kiriyê çarox û kulavê şivanan
Giş ji bo xatirê qama bûkanî, bejn û ba-
la zirav
Ka hela bibînim Fatima Salih Axa li vê
dinê
Hesreta dîtina te xatûnê bi xwe re nebim
mirinê lê
Ay de lê lê lê Fatima min î lê lê...!

Dema Mihemed van gotinan dibêje
Fatim jî, vedigere, tê cem û her du bi hev
re li ser bext û dîn û îman soz û biryar di-
din hev. Li ser qewlê şivantiyê, şeş
mehên Mihemed bi şivanî diqedin. Mi-
hemed berê xwe dide mala xwe û malba-
ta xwe digire, tîne mala bavê Fatimê. Bi
qewl û resûlê Xwedê Fatimê jê re dixwa-
zin. Dawet û dîlana wan li dar dixin û Fa-
timê digirin ji Mihemed re dibin.

(Qediya)

BERHEVKAR: ROŞAN LEZGÎN

kedkarên welatparêz kovareke nû:

Emekçiler



derket pêşberî xwendevanan. Edîtorê kovarê, di nivîsa despêkê de diyar dike ku wan plan û projeyên xwe li gorî meha-darê saz kirine lê ji ber astengiyên ku dewletê derxistine, kovar bi mehek derengî derketiye. Edîtor wiha didomîne: "Derengmayîna ji ber astengiyên dewletê, bandoreke neyînî li naveroka nivîsên kovarê kir. Ji ber vê yekê di vê hejmarê de nivîsên kovarê her çiqas ji rojevê dûr dixuyin jî, em bawer in naveroka wan hîn jî girîngiya xwe diparêze."

Kovara Emekçiler (Kedkar) ku xwe wekî dengê kedkarên kurd bi nav dike xwerû bi tirkî ye. Pêwîst e nivîsên kurdî jî tê de cih bigirin.

Di yek ji nivîsên kovarê, nivîsa Fadime Gökbakır a bi navê (Ekonomî: Seçimden Sonra Tufan 'Aborî: Piştî hilbijartinê tofan e') de tê diyarkirin ku IMF'ê têkiliyên xwe yên bi Tirkiyeyê re heta hilbijartinê rawestandîye. Gökbakır dide zanîn ku birjuwaziya Tirkiyeyê dixwaze ji sandoqan ANAP û DSP derkeve.

Eger ew nebe, dibe ku qeyrana aboriya Tirkiyeyê kûrtir bibe.

Di hejmara yekemîn a Emekçiler de nivîsek balkêş a din jî gotara Hüseyin Deniz a bi navê (Emekçileri Satma Konseyi İş Başında 'Konseyiya Firoşkar a Kedkaran li Ser Kar e') ye. Di gotara xwe de Deniz diyar dike ku Civîna Konseyiya Aborî-Civakî (ESK) ku ji aliyê alîgiran ve wekî serkeftî tê pejirandin, rexne dike û berevajî vê yekê wê civinê wekî firotina keda kedkaran bi nav dike.

Di kovarê de wekî din nivîsên kesên mîna Abidin Kızılyaprak, Murat Akıncılar, Ahmet Şiyan, İsmail Dizdar û Nejdît Uygun jî cih digirin.

Xwedî û berpirsîrê karê nivîsaran ê Kovara Emekçiler Ahmet Kaya, armanca derxistina kovarê ji bo me wiha raxekir: "Armanca me ev e ku em bibin dengê kedkarên kurd. Yek ji hedefên me ew e ku em bi kurdên hemû deverên Kurdistanê, Tirkiye û Awrûpayê re têkiliyan deynin û daxwaz, hêvî û xebatên wan bi perspektîfa kedkarekî/e kurd yê/ya welatparêz binin zimên."

SERWÎSA ÇANDÊ


Ji Başûrê Biçûk helbestên jiyân, evîn, mirin û ronahiyê:

Di bin dilovaniya jiyânê de

Pirtûka helbestan a Mihemed Hemo ya bi navê "Di Bin Dilovaniya Jiyânê de" derket. Pirtûk ji destpêka 1999'an ve gihîştîye ber destê xwendevanên Başûrê Biçûk. Xwediyê Pirtûkxaneya Bedirxan, M. Hemo li Başûrê Biçûk li Efrînê ji dayik bûye û ji sala 1980'yî vir de li Helebê dijî. M. Hemo berî vê pirtûkê du pirtûkên din ên bi navê Civata Kulîlkan (şano) û Seyrana Dil di Şîna Evînê de (helbest) jî weşandibû. Helbestên "Di Bin Dilovaniya Jiyânê de" ku bi kurdî (zaravayê kurmançî) û erebî cih digirin, ji bo zimanê erebî ji aliyê Axîn ve hatiye wergerandin. M.Hemo di pêşgotina pirtûka xwe de, sedemên wergera helbestan bo erebî dinirxîne. Li gorî wî sedem ev in: Di warê nivîsandina kurdî de bi rewşenbîrên ereb bawernekirin, danasîna wêjeya kurdî, di pirtûkxaneya erebî de cehgirtina zimanê kurdî.


Di pirtûkê de bi giştî 17 helbest cih digirin. Tevna helbestên Hemo bi piranî jiyân, evîn, mirin û ronahiyê hatiye rêstin.

Mirov dikare navên çend helbestên di pirtûka "Di bin dilovaniya jiyânê de" de cih digrin, wiha rêz bike: Raperîn di tariyê de, Helbest, ?,..., Dema bedewîş, Nijdar, Gunehkarî û hwd.



Vîva HADEP

OSMAN ÖZÇELİK



Hilbijartinên 18'ê avrêlê em ji hev û din bi dûr xistin. Ligel hişyarkirinên birêz Samî Tan jî, min mecal û dem nedît ku ez binivîsim. Ya rast ez ji ber vê ne xemgîn im. Ji ber ku di nav rûpelên rojnameyê de em rû bi rû hatin ba hev û din.

Bi sedema hilbijartinan min gelê xwe ji nêzîktir ve dît. Ez careke din têgihîştim ku em ji bo gelê xwe çi bikin, dîsa jî têrê nake. Gava mirov dikeve nava gel, gel ji mirov re dibe neynikek krîstal û mirov tê de, ne tenê rû û laşê xwe dibîne. Mirov di neynika krîstal de, digihêje kûraniya ruhê xwe û mirov durûtî, bêbawerî, tirsonekî û hemû kompleksên xwe yên bincilkirî yên veşarî dibîne. Gel vê şansê dide mirov ku mirov bi ser xwe ve were, li xwe vegere. Tîrêjên ronahiya neynika krîstal, şoqeke bihêz li dil û ruhê mirov dixwe.

Gava mirov dikeve nav gel şoqeke din jî dixwe. Şoqa dewletê. Mirov dibîne ku dewlet ne tenê bi leşker, polîs, tîmên taybet; bi tank, panzer û bi helikopteran ketiye nav gelê me. Dewlet bi kî nê nefrekeke mezin li wir dijî. Bi

derew, bi xapandin û bi fesadiyê jiyana xwe berdewam dike. Mirov ji nêzîk ve dibîne ku gel çiqas aşîxwaz be, dewlet jî ewqas şerûd e. Gel çiqas bi dilrehm be, ew jî ewqas zalim e. Gel bidevalayî jî çiqas bêtirs be, ew ewqas tirsonek e. Xofa ku gel xistiye dilê dewletê, ew bêhiş xistiye. Di nava tenêbûnekê de, ne tenêbûn, tirs aniye. Ji her tiştî ditirsin. Ji mêran, ji jinan û ya pirtir ji zarokan... Ji siya xwe ditirsin. Tirsê kiriye ku tenê bi çekan bawer bibin û xwe bispêrin çekan. Li her derê destên wan li ser çekan in, an jî ew bi xwe li ser çekên motorîze ne.

Û em çûn. Berendamên HADEPê... Berendamên parlamentoyê, berendamên serokatiya belediyeyan, berendamên meclîsa belediyeyan... Bi krawat, bi solên boyaxkirî û bi porê şehkirî. Û berendam ji wir rabûn. Bi rûyê kurkirî, bi kincên ûtîkirî û em bi strana "Amedê-Amedê" bi slogana "Emê xwe jî, bajarê xwe jî, bi xwe îdare bikin." Û gelê ku bêdeng dixuya, bi çepik, bi govend, bi lîlandin û bi îşareta "V" ya serkeftinê bi me ve rabû, pêşwaziya me kirin.

Bû vîze vîza tirimbêlan, bû ûre ûra qorneyên panzerên wan. Şaş û metal man, har û dîn bûn. Dest bi binçavkirina û tirsfirandinan kirin.

Nehîştin em biçin gundan, rîya gundan li me girtin. Nehîştin em bi gel re civînan bikin, em hev û din himbêz bikin. Nehîştin em afîş, poster û sembolên HADEP'ê bidarvekin.

Girtin ser avahiyên HADEP'ê ku her tim bi keç û xort û kal û pîr û bi zarokan mişt bûn.

Nehîştin em ji bajarekî biçin bajarekî din. Li ser rîyan, li serê çîyan em dane rawestandin. Bi panzer û leşkeran dora me girtin. Bi dehan, bi sedan car nasnameya me li cem xwe nivîsîn. Bi sedan car li ser me gerîyan, li hundirê sola me, li hundirê cilên me yên binî saxtî kirin. Di kerilca guhên me de, ji me re gotin "Em nahêlin hûn bêne hilbijartin." Mitîngên me bêsedem qedexa kirin, bi daran êrîş birin ser jin û mêran.

Li Mêrdînê 70-80 kes hatibûn binçavkirin. Em çûn cem walî ku em jê bipirsin "çima?" walî got "slogan avêtine!" Me jê pirsî "Ma qey avêtina sloganê qedexa ye?" Got "Na, belê gotine 'bijî'!" Me got "Çi bûye, gotine 'Bijî HADEP' çi zirara ve heye?" Walî yê me got "Piştî ku we got bijî, li pey vê gotinê, hûn çî gotinê bibêjin jî, em dizanin hûn qesta çî dikin." Me got: "Baş e, de ka em çî bêjin." Walî got: "Nebêjin bijî, hûn çî dibêjin bibêjin. Mesela bêjin Vîva HADEP". Walî dixwest em bi îspanyolî biaxivin. Tu tiştêkî ku em ji walî beg re bêjin nemabû, em rabûn derketin, çûn...

Me milyon û nîvek deng girt. Ya rast me milyon û nîvek deng ji devê şêr xelas kir. Ev beramberî pênc-şes milyon mirovî dike. Û pêlek xurt ji binî ve tê. Pêla zarokên me yên ku bi kevîran nedihîştin ku partiyên din bikevin nava kuçe û kolanên wan.

Hadepiyan binedin



Li Gebzeyê roja jimartina dangan, li ser sandoqan çavdêrên HADEP'ê jî hebûn. Çavdêreke partiye tirk diçe destavxaneyê û bi tirs û qîrîn vedigere û dibêje: "Li destavxaneyê bombe heye." Polis di cih de dibêjin: "HADEP'yan bigirin, binedin, bila nevin." Li ser vê gotina polîsan, çavdêrê HADEP'ê dibêje: "Ka bombe. Ger hûn me digirin, bisekinin, ez biçim binihêrim."

Destûr nadin ku çavdêrê HADEP'ê biçê binihêre, her wiha wan wekî sûcdar digirin. Piştî gazî polîsên pisporên bombeyan dikin. Polîs tîn, yek ji wan diçe hun-

dirê destavxaneyê, poşetê digire, destê xwe dike na-va poşetê ku tê de pîsî heye. Yekî tê de pîsî kiriye û daleqandiyê. Destê polîs giş di nav pîsiyê de dimîne. Li ser vê yekê çavdêrên partiyan giş dikenin. Wê gavê heman çavdêrê HADEP'ê jî bangî polîs dike û wiha dibêje: "Birêz memûr, te divê wî bibe laboratuwarê tehlîlê bike ka yê kê ye!"

Xwendevan paqjiyê dikin

Li Amedê rojekê berî hilbijartinê, du xwendevanên zanîngehê gava diçin dibistanê, di rê de yek ji wan kaxiz-maxizên di destê xwe de davêje rastê û kolanan qirêj dike.

Piştî hilbijartinê, dîsa heman xwendevan di rê de dimeşin. Vê carê xwendevanê din, kaxizên di destê wî de davêje erdê. Xwendevanê din li dijî wî derdikeve û dibêje:

- Tu çima kaxizên xwe davêjî û kolanan qirêj di-

ki?
 Yê din dibêje:
 - Ma hê duh te jî diavêt. Tu çima ji min re dibêjî?
 Hevalê wî bersivê dide û dibêje: "Ma duh duh bû, îro îro ye. Duh belediye di destê Refahê de bû, min diavêt, îro di destê HADEP'ê de ye!"

Di destê HADEP'yan de histirî heye

Li bajarekî Tirkiyeyê waliyê bajêr berendamên belediyyan ê partiye tirkan kom dike û ji wan re dibêje: "Li hemberî HADEP'ê giş bibin yek û min mecbûrî girtina destê HADEP'yan nekin. Lewre hûn dizanin di destê HADEP'yan de histirî heye."

Înşelâh emê qezenc bikin

Dayikekê herî dawî di

hilbijartina sala 1987'an de dengê xwe bi kar aniyê. Di vê hilbijartinê de jî bi kêf diçe ser sandoqê û dengê xwe dide, bi kêf vedigere û dibêje: "Min di 1987'an de dengê xwe dabû Turgut Özal wî qezenc kir, aniha min dengê xwe da HADEP'ê, înşelâh ewê qezenc e."

Tu bi xêr hatî Serokê min


Serokê Belediyyaya Licê berî hilbijartinê jî bo propagandayê şeş caran dikeve rê ku here Licê hemû caran jî leşker wî deriyê Licê vedigerînin û nahêlin ku bikeve Licê.

Di hilbijartinê de piştî ku diyar dibe ku wî serokbelediye qezenc kiriye, dîsa dikeve rê û diçe Licê. Îcar, leşkerên ku nedihîştin ku biçê Licê, berî herkesî diçin pêşiya serokbelediye, pişkove xwe girê didin û wiha dibêjin: "Tu bi xêr hatî serokê min, seran û ser çavan."

BERHEVKAR: C. ANDOK

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (170) XAÇEPIRSA

W	T	M	A	A	A	A	A	B	S	
D	B	R	A	N	K	A	L	K	A	N
R	B	S	P	I	E	D	L	I		
T	R	T	R	E	V	G				
K	C	D	K	A	R	T				
Ê	Ş	A	R							
B	N	D	E	M						
M	E	W	K	I	L	I				
R	A	S	T	A	R					
S	E	R	E	K	A	N				



Bersiva Xaçepirsa 168'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binixînin û bi riya peşkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 170'yî Pirtûka Weşanxaneyê Pêrî '1880 Ş. Ubeydullah Kürt Ayaklanması' ye


Jêrenot:
 Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

1880 Şeyh Ubeydullah Nehri Kürt Ayaklanması

Prof. Dr. Celîlê Celîlî

pêrî şayolari

Reisicumhur Feridûn ... (wêne)	Meslek Ez benî	Sembola bor e	Nik, kêlek Nehişk	Dêla heywanan Tolaz (bi deverkî)	Tîpa dawîn
Rengêk		Çiroknûse ki rûsî Deriyê dikanê	Bêkêmasî Hejmarek	2	Xwarina êvarê
Notirvan			5	Tîpa dû m'yê	Kesê pêdiviya wî/ê bi avê heye
Peyveke pirsê Baneşane k	Agir Şamî	Qertafek ... sor	Mîna, wekî Vêxistin	Zêr û ... Mêzekir	
Sober					
Pireke li Amedê			4		
Bi devokî roj Tipeke kurdi		Çerçî Tîpa pêşîn			
1	Hokera pirsiyarî		Cephe, bere		




MEM KAYA

RÊVEBIRIYA BELEDIYÊN GELEK BAJARÊN
KURDISTANÊ KETE DESTÊ HADEPÊ.

BÊJING

WEY QADIRO!
TU QIQAS KUBAR
BUYE LAWOO!..



İMİRALÎ RA
XEBER ESTA


Öcalanî pawitînê dewlet pûç vetî

MEMED DREWŞ
(e.mail:mehmet@welat.com)

Abûkatanê Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî ra Niyazî Bulganî 26'ê menga avrêla 1999'ê de vat ke, eke rewşê Öcalanî zey ewro dewam bikiro, Öcalan mehke- ma de ifade medo, haqê xoyê bêvengmendin bixeftino. Abûkatê Öcalanî wast ke dewlet rojê ravey, politikaya tecrîtkerdin virado. Abûkat Bulganî da zaniyan ke, eke dewlet politikaya tecrîtkerdin mevirado û zey ewro dewam bikiro, ne imkanê înanê parastin beno û ne jî Öcalanî beno. Rewşê ewro ya hedrekerdinê parastin mimkûn niyo û cayê jî nêvinyayo.

Abûkat Bulganî da mûsnayin ke, kerdenê dewletê ewnoyîni, hem hîlalkerdinê hiqûqê zerî yê û hem jî hîlalkerdinê peymananê navneteweyî yê; lazim o ke dewlet Öcalanî rê muameleyê tepşiyayin bikiro. Tepşiyayeyê bîni wayirê kamûnî haqan ê, lazim o Öcalan jî wayirê ê heqan bo. Abûkatê Öcalanî Niyazî Bulganî wastenê xo wina ardî ziwan.

"Vernî de lazim o ke sînorkerdi- na seata pêdiyîn hewadiyo. Ma bişê her roj û seata mesayî de, Öcalanî ya bêsînor pêdiyîn virazê. Qandê (serba) imaknê hedrekerdinê parastin çiçî lazim o bidiyo ci. Yanê televizyon, radyo, rojname, belge, pirtûk û zey nînan".




Goreyê vatena abûkatî, qandê nê wastanan, înan muracatê Masayê Krîz ê Serokwezîrin û DGM'ya Enqere kerdo. Feqet hetanî nika cewab nêdiyayo ci. Ancî goreyê vatena abûkatan; Öcalanî qandê parastin daktîloya nûstin wasto ke. Girotxananê (Zindananê) bînan ra jew PKK'yîj, Sabrî Ok û çend embazê bîni bidiyê ci het, yan jî o bidiyo cayêdo bîn.

Bi rastî wexto ke, kes abûkatana qisey keno û rewşê Öcalanî mûseno, a seat girdîna Öcalanî heveyna nezdi ra fahm keno. Bifikiriyê tik û tenya ne jew roj- name, televizyon, kovar û radyo û ne jî tevayêdo bîn. Jew hefte de di finî raya abûkatana biyayanê teverî ra xeber geno. Yanê 168 seatanê jew heftey ra 166 saetî tenya maneno, 2 saetan jî abûqatanê xoya

ravêrmeno. Bi rastî wexto ke, kes nînan hesab keno bawer (yeqînemel) nêkeno jew mardim bişo vera nînan vindiro. Tabî nînan het vardayinê psikolojik jî estê. Mayê nînan hesab nêkemî. Çike dinya de nimûneyê çi çiniyo. Ca de Öcalanî de kam biyayê nika bibi xînt. Heta goreyê vatenan dewlet Öcalan qasî wina tenya temayo û tecrîtkerdo ke, xînt bo. Feqet mayê ewro vînem girdîn û xoverdayina Öcalanî serdarê dewlet şaş temayê. Goreyê vatena jû vatena abûkatanê Öcalanî ra A. Zekî Okçuoğlu ya yena mi virî. Okçuoğlu mi ra vatibî ke "dewleta qasî rojê mehkema kena derg ke, Öcalan tenya mendin ra xînt bo, bado vejo werte û Öcalanî ar û arbet bikiro. Feqet Öcalanî no planê dewlet dî û pawitînê dewlet pûç vetî.

Weçîntena
18'ê Nîsane



LERZAN JANDNÎL

W eçîntena 18'ê Nîsane ser ro zaf çiyî ameyî vatene û nivisnayene. Bê guman fikr û bawerîya her kesî esta. Her kes enceman de ra angorê xo niya dano, angorê întereseyanê xo ci ra dersan veceno, xo rê pare veceno.

Ma jî ganî nê encaman ra dersan wecîme. Çikê dersê ma? Ez naca wazena nînan ebi kilmiye rêz bik- erî.

Her çî ra ver ganî zaf rind bêro zanayene, ke îktî- dar de wayirê sozê girsî biyena Ecevîti û Devletli nişanê qewet û avêrşiyena têkoşîna şarê ma wa. Bê avêr û qewetir biyena têkoşîna şarê ma nê Ecevît ne jî Devletli nêşikiyêne, ke îktîdar de wayirê nê sozî biyêne.

MHP'ye seba zaf kesa biye suprîz. La belê ganî rind bêro zanayene, ke hereketê faşîstî virêndiye kolanan de hakîmiyetê xo virazene û bado jî ênê îktî- dar. Terorê faşîstan-ke daye ra ver jî bî, ganî teba dîro- ka dînan bêro famkerdene. Her cenaze de jî biyene. Kenya ra remnayena A.Öcalanî ra dime tayîna bî zêde û hetanî lînc şî. Na meseleye de dîroka îktîdar biyena Musolînî û Hitlerî zaf balantox a. Musolînî weçîntena 16.11.1919'î şêherê xo yê xurtî de jî kerd vîndî. La belê terorê kolanan kerd zêde. Her ca de sosyalîstî, serokê karderan ser ro teror amê vaydayene. Hetanî ke 1924 de, yanê 5 serî ra tepiya amê îktîdar. Hitlerî jî na raye taqîp kerde. Weçîntena Gulane 1928 de Hitlerî sed de 2.6 rayî guretî, weçîntena aşma 9. sera 1930 de sed de 18.3 rayî parlamento de 107 sandaliyî guretî. Ebi şîddet, teror û hetkariya kapîtalîstanê girsî weçînt- ena 5.3.1933 de jî sed de 44 rayî guretî û amê îktîdar. Naye ra tepiya se bî, qeyî niya bî, ma pêro zanîme. La belê angorê bawarî û diyena mi hunî nê çiyân ra dersî nêyamê guretene. Zaafe komûnîstan, sosyalîstan; Hela vindere sebeno; Ê bîni seba ma ra çiyê kenê; parçe- biyene; hesabî kijekî ganî êndî bêre diyene û nînan ra derse bero guretene.

Encamê weçînetene psikolojî û sasyolojiyê şaranê Tirkiye rind keno eşkera. Zê yew nimûneyî dayikê leşkeranê wurizî/rûsî hemverê ruşnayena lacanê dînan ve Çeçenîslanî veciyenê, dayikê Tirkiye duştê naye de tayîna zêde gonî tayîna zêde sarê kurdan wazenê. No û nimûneyê bîni sebebê diyena ma wa raştiye bo, angorê daye politikîka kerdene ma bo!

İktîdar biyena nê her di kilîkan, nişanê têkoşîna şarê ma wo. La belê ganî modem peyniya na avêrşeyene bêro, kêmasî û tengasiyan ra xo raxe- lesnîme.

Rayê HADEP'ê bê guman nişanê fedekarî, zanayena şarî û cesaretê şarê ma yê. Her çîqa ke reîsê belediya biyene problemanê şarê ma hal nêkena, ebi reîs biyene meseleyî nêqedînê, la belê newe dest kenê ci. Ganî reîsê ma naye rind bizanê. Angorê naye xo amade bikerê. Şarê ma ganî hem reîsanê xo rê bar mebo, durimê dînan rind verê çimanê xo de bicêro û hem jî înan teyna meverdo. Ê jî her çî ra ver seba şarê xo se hetanî nika têkoşîna da, lec kerdo, fedekariye kerda, ganî naye-ra tepiya jî ebi bawariyêde tayîna xurtiriye dewam bikerê.

Pratik de beno, ke tayê kesî duştê weçî- tenekewtene HADEP'ê biyê jî. Na teyna xo ser ro nêşîkîna vindetena maya politikîka ewrojine bivurno. Ewroj roje roja-teba ferqanê xo, teba fikranê xo, bawariyanê xo yewbiyan a, avêrberdena têkoşîna şarê ma wa, wayîrveciya qedr û qimetanê şarê ma wa.

1

Endamê MYK'ya KESK'ê Faysal Özçift:

ê Gulanê dê bibe qada bangawaziya kurdan

Endamê Lijneya Rêveber a Navendî ya KESK'ê Faysal Özçift ku di nav konfedarasyonê de sekreterê Beşa Mafên Mirovan e jî, der barê 1 Gulanê, muxalefeta civakî, tewra Türk-İş û Hak-İş'ê û çend xalên din de pirsên me bersivandin


Birêz Özçift, em dixwazin ku hûn encamên hilbijartinan jî li ber çavan bigirin û wisa bersiv bidin. Li gorî we li vê cografyayê wate û girîngiya 1'ê Gulanê çi ye divê çawa bê pîrozkirin?

Di serî de dixwazim bibêjim ku 1'ê Gulanê îsal, dê ji pîrozkirinê 1'ê Gulanê yê berê zêde-zêde cudatir be. Ji ber vê cudabûnê, bi taybetî li bajarê Stenbolê hêzên dewletê bi hewlên giran ketine nava tevgerê. Daxuyaniyên qedexekirinê jî raya giştî re ragihandin. Lê li hemberî biryardarbûna muxalefeta civakî ku konfedarasyona me jî tê de ye, mecbûr man ku gavên xwe bi paş ve biavêje. Di serî de Stenbol, li gelek bajarên mezin, dê cejna 1'ê Gulanê were pîrozkirin.

1'ê Gulanê, dê bibe qada bangawaziya azadiya gelê kurd. Her wiha dê bibe qada xwestekên karker û kedkarên tirk û kurd. Bêguman 1'ê Gulanê dê bibe roja jiholêrakirina astengî û qedexirinê li hemberî gelê kurd û kedkaran jî. Çawa ku di Newrozê de, tevahiya qad û kolan ji kurdan re hatin qedexekirin, bi zordarî û pest û kotekiyên giran bi ser Kurdan de çûn jî, bi ser neketin û qad û kolan dîsa jî kurdan re man, ez di wê baweriyê de me ku, vê carê jî, çiqas astengî derxin pêşberî me, dê gelê kurd û kedkarên tirk û kurd bikin ku kesên dixwazin ku naveroka rojên wiha watedar vala bikin, piştî stûyê xwe bixurînin.

Pêvajoya ku em tê de ne, bi rastî jî pêvajoyeke reş û tarî ye. Panoramaya ku piştî hilbijartinê derket holê, panoramayeke karesat e. Divê panoramaya reş û tarî de, qîrîkirin û bangkirina daxwaz û xwestekên azadixwaz û insanî, gelekî girîng û watedar e. Ez di wê baweriyê de me ku, dê gelê kurd derkeve qadan û azadiya xwe bilêv bike. Gelê Kurd dê carekê din qîr bike ku roja wan nayê tarîkirin. Bi kurtasî ez bibêjim cejnên wiha qedexekirin jî nekin jî, kevneşopîya têkoşinê dê her berdewam be.

Türk-İş û Hak-İş'ê, derbarê bihevê pîrozkirinê de helwesteke cuda nîşan dan. Diyar e ku ev sendikayên navborî dê pîrozbahiyên



xwe di salonan de heps bikin. Hûn vê yekê çawa şirove bikin. Helwesteke bi vî rengî dê bandoreke çawa li pîrozbahiyên bike?

Ne xêr! Helwesta van sendikayan dê bandorê li pîrozbahiyên neke. Berê jî ketibûn nav keft û leftên wiha. Di destpêka salên 90'î de ji dema kesên şoreşger û welatparêz derketin qadan, van herdu sendikayan xwestin ku naveroka 1'ê Gulanê û ruhê tekoşinê vala bikin. Piştî bi armanca ku 1'ê Gulanê bikin "Rojeke fermî" di nav çalakî û xwepêşandan de jî cih girtin. Lê mixabin girseyên xwe jî seferber nekirin. Em dikarin bibêjin ku TÜRK-İŞ jî, HAK-İŞ jî, di rastiyê de ne rêxistinên karker û kedkaran e. Îro her kes dizane ku ji bo berjewendiyên xwe û rejîmê kar dikin, ne ji bo karkeran. Wê karker bêyî van sendikayan jî kolan dagirin.

We got ev sendika ne sendikayên karker û kedkaran e. Nexwe hûn wan çawa bi nav dikin?

Çawa ku dewleta tirk, ji bo rê li ber tekoşina rizgariyê bigire, tevahiya mafên wan ên insanî binpê bike, qoriciyan derdixê holê û wan bi kar tîne; ez dikarim bibêjim ku TÜRK-İŞ û HAK-İŞ ji bo ked û rûmeta kedkaran binpê bikin, li ser keda wan rûnên, dixebitin. Ango ew jî

sendikayên qorici ne. Jixwe di serî de, ev her du sazî bi destê dewletê hatine damezirandin.

Li gorî we, di pêvajoyeke ku gûrên boz dizûrin ango pêvajoyeke ku bayê neteweperestan berz û xurt bûye de divê helwesta sosyalîst û muxalîfan çawa be?

Wekî hûn jî dizanin, hilbijartinên derbasbûyî ji me re nîşan dan ku sosyalîst û çepgir peywira xwe baş bi cih neanîne. Ji pîrgirêk û aloziyên gelê dîrbûn, li gorî xwe wekî muxalefet hesibandin. Ji bo ku ji HADEP'ê dîrbikevin, li hincetan geriyan. Ev tewreke neyênî û handikapeke mezin bû. Divê ev pêvajoyê bibe pêvajoya dersgirtinê û ji yekîtiyê û bihevrebûna sosyalîst û muxalîfan re, rê veke. Lewre jî 1'ê Gulanê ji bo vê yekê, li gorî baweriyên min divê bibe destpêk. Bi hevrebûn û yekîtiyê heger li qadê pêk were dê ev yek ji bo pêşerojê jî bibe hêviyê xurt û girîng.

Birêz Özçift, gotinên we yê dawî...

Li dijî hemû astengiyan jî ku Almanya Hitler û İtalya Mûsolîni tîne bîra mirov, ez bawer im ku kesên li cem azadî, ked û aştiyê cihê xwe digirin, dê tu car serê xwe netewînin.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

Kê çi got?

Aydemir Güler (Serokê Giştî yê SİP'ê):

Di 1'ê Gulanê de em wekî SİP li qad û meydana e. Em dê dilsozî û girêdana xwe li hemberî şehîdên xwe qîr bikin. Encamên hilbijartinê, girîngiya yekîtiyê û bihevrebûna çepgirên tirk û kurd baş radixe ber çavan. Pêwîst e ku em tekoşina hevpar birêxistin bikin. Tê xwestin ku neyartiya bi kurdan re bê afirandin. HAK-İŞ û TÜRK-İŞ baş dikin ku dernakevin qadan. Lewre ew ne lajiqî wan deran e. Ew axayên sendikayan e. Divê di zûtirîn katê de li dijî faşizmê xeta berxwedanê pêk were.

Kemal Okutan (Endamê Meclîsa Partiyê ya HADEP'ê)

Ji bo ku em xwe bigihînin gelê tirk ê kedkar û ji bo ku em mesajên rast bidin karkeran, em dê giraniya xwe bidin 1'ê Gulanê. Tevî zordarî û astengiyan, tevî politikayên ku mirovan ji dirûv dixin, em dê hewl bidin û 1'ê Gulanê li qadan pîroz bikin. Rêlibergirtina faşizmê encax bi yekgirtina çîna karkeran pêkan e. Eniyêke bi vî rengî wê piştî û pêla neteweperest û şoven bişkîne. Di vî warî de çî ji destê HADEP'ê were dê bike û di vî warî de ji bo ku em emîyê çepgir saz bibe dê hewl bide xwe. 1'ê Gulanê ji bo vê yekê firsendek e. Divê kedkar û karkerên kurd xwedî li vê rojê derkevin, lewre ev roj ne di bin tekela tu kesî û rêxistinê de ye.

Hakan Tahmaz (Endamê Lijneya Rêveber a Navendî ya ÖDP'yê)

Diyar dibe ku neteweperestî û şovenîzm di rojên pêş de wê zêde zêde derkeve pêş. Bi taybetî di pêvajoya darizandina Öcalan de, wê hincetê derdorê wê hincetê jî bi kar bînin. Lewre jî divê hêzên sosyalîst û çepgir li hemberî wê pêla şoven hişyar bin. Divê roja 1'ê Gulanê kesên alîgirê azadî, ked û wekhevîyê ne bibin yekdil, yekmîl û yekmêjî.

Mehmet Kılıçarslan (Cîgirê Serokê Giştî yê EMEP'ê)

Di yekê gulanê de, tevî sendikayên karkeran em dê li meydana bin. Emê li gorî ruh û naveroka 1'ê Gulanê tevbigerin. Emê di bin ala fikra ku naveroka sendikayan vala nake, lê, xurt dike de bin.

Aşur Kurgen (Serokê Beşa Birêxistinbûnê ya DİSK/Genel-İş'ê)

Ji 15'ê avrêlê heta niha DİSK û KESK di nav dan û standin û xebatê de ne. Ez bawer dikim ku her çiqas TÜRK-İŞ û HAK-İŞ'ê biryareke qîrê jî girtibin, şaxên van sazîyan tevî karkerên wan guh nadin vê yekê. Di belediye-yên ku em birêxistin in de xebatên me bêrawestan berdewam in. Îro peywira hêzên demokasiyê girantir bûye, me hay ji vê yekê heye.